



Kurdistan seranser bi kesk û sor û zer xemilî

Newroza 1993'yan bi beşdariyeke girseyî derbas bû. Di rûpel 8-9 de bixwînin



KURSIYÊ YELTSÎN DIŞEMITE

Li Rûsya, di rojên dawî de tevlihevî û pirs-girêk zêde dibin. Parlamento li hev dikeve, gel dîsa li meydanan xwepêşandanan li dar dixe. Yeltsîn dixwaze hemû kes û şopên komunist ji pêşiya xwe rake, ji bo vê jî, bi qerarnameyên nû rayeyên xwe zêde dike. Komunîstên Parlamentoyê jî Yeltsîn bi dîktatoriyê sûcdar dikin, wî didin mehkemê û li pey, ji nû ve avakirina sistema komunist a Sovyetê ne.

Di rûpela 4'an de bixwînin



PROJA GAP'Ê ÇI YE?

GAP, di mercên niha de, ne bi tenê nişana pêşveçûnê ye. Lê nişana siyaseta dewleta dagirker a Tirk e. Projeyên GAP'ê û yên din jî, nişana siyaseta Tirk in. Di rastiya xwe de ev proje, navgîna geşkirin û pêşvebirina siyaseta dagirkerî ye. Asîmîlekirina civakê bi vê projeyê tê hesabandin.

Bêrîvana Dêrsimî nivîsî. Rûpel 6

REWŞ



Abdullah Keskin

Hinekî mesûliyet

Têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê ji vir û pê ve dikeve merhaleyê nû. Demeke gelekî krîtîk dest pê dike. Bar û mesûliyeta me hemûyan zêde dibe. Her gavê xwe divê em bi hesab û zanebûn biavêjin. Ji bo serfirazbûnê ev mesûliyet pêwîst e.

EM KURD...

Gelek tiştên me berevajî ne. Hê jî em Kurd bi çavê neteweyekî li xwe nanêrin, ev kêmasiyê girîng e. Wexta çar kes têne ba hev, xwe wek nava dinyayê dihesibînin. Bi herkesî re em ji hevdu bêhtir dikarin rabin û rûnin. Zehmetiya mezin banandina me xwe bi xwe ye. Kurd gelekî zehmet tîne ba hev. Dîtin û ramanên me, rexne û nirxandinên me jî naşibin hev, ev jî xwe ji vî aliyê me distînin. Jixwe dewletên dagirker di nava me de sînor çêkirine. Lê sînorên mezin em xwe bi xwe di nava xwe de çêdikin. Dêrdorê me, dagirkerên welatê me zept kirine. Bi ser vê de jî, her parçe di nava xwe

de bûye deh parçe.

YEKÎTIYA ME

Yekîti gelekî ji me dûr e. Yek ji sedemê vê rewşa me ya xerab jî ev e. Em gelekî rehet dikarin bikevin dijî hev. Mişterekên me zêde ne. Lê tu caran em li dora pirsgrêkên xwe li hev kom nabin.

Yekîtiya Kurdan heta niha di çîrokên çil mezal (oda) de bû. Mifteya deriyên jî li piştê Çiyayê Qehf hatibû veşartin. Ew deriyê-pola îro jî xwe re vedibin, yek bi yek. Ji bo me tevan ev

Yekîtiya Kurdan heta niha di çîrokên çil mezal (oda) de bû. Mifteya deriyên jî li piştê Çiyayê Qehf hatibû veşartin. Ew deriyê-pola îro jî xwe re vedibin, yek bi yek. Ji bo me tevan ev fersendeke mezin e. Ev fersendê hêsan nakevin destê mirov. Ji vê yekê jî herkes divê bi mesûliyet hereket bike.

fersendeke mezin e. Ev fersendê hêsan nakevin destê mirov. Ji vê yekê jî herkes divê bi mesûliyet hereket bike.

WEŞANÊN ME

Herkes gerek e îtiraf bike ku, ev

pêvajoya (sûreç) nû, ne bi alîkariya weşan, rojname, kovar û xebatên ronakbîrên Kurdan çêbû. Mirov dikare bibêje ku, roleke wan î negatîv hebû. Ji bo muhasebikirina van babetan fersendeke baş ketiye destê me tevan. Herkes divê êdî jî dûr ve bi çavê rexnegir li xwe binêre, polîtîkayên xwe yên rast û çewt jî nû ve binixîne.

Rewş heta niha wilo dide xuyakirin ku, hin kes ne di vê zanebûn û mesûliyetê de ne. Li deverna nivîs û nirxandinên çewt, heta mirov di cih de bi nav bike; provokatîf, derdikevin. Bi mantiqekî çewt mirov tahrîk dikin. Ev helwest jî fêde bêhtir zerarê tînin. Zerara wan a mezin jî, ji xwediyê wan re ye. Herkes divê lingê xwe bi baskî xwe ve bikişîne û ji rewşa îro re şikir bike. Fêdeya hesabên biçûk û şexsî, ji tu kesî re nîn e.

Yekîtiya Kurdan ji însanên me tev de re wek xewnekê dihat. Îro ew xewn dibe rastî. Heta niha li ber yekîtiyê gelek asteng hebûn. Şerê di nava tevgerên Kurd de, têkoşîna gelê Kurd gelo çiqasî bi paş xistin? Em niha dev ji muhasebeyê wan bûyeran berdin. Dêrok wê muhaqeq hikmê xwe bide. Gerek e berê me li pêşerojê be.

Em ne bêhêvî ne. Ji bo hêviyan delîl zehf in. Ji bo yekîtiya gelê Kurd, kî çî ji destê wî were, gerek e bike. Ji niha ve, îro... Her çaxî fersendê nakevin destê mirov. Sibe belkî gelekî dereng be.

FERHENGOK

- Afirandkar:** Afirîner (Yaratıcı)
- Bac:** (Vergi)
- Bersûc:** (Sanık)
- Canemerg:** Pakrewan, şehid
- Cendek:** Cenaze, laş mirovan ê bécân
- Daketin:** Hatın jêr (İnmek)
- Dik:** (Sahne)
- Dubendî:** Dîjberî, nakokî (Çelişki, çatışma)
- Endam:** Aza (Üye)
- Endamê Hurmetê:** (Onur üyesi, fahri üye)
- Firmîsk:** Rondik, hêstir
- Gir:** Mezin, gaz (Büyük, tepce)
- Henas:** Nefes
- Hilekiş:** Bêhnfişk
- Hilkişin:** (Tirmanma)
- Hilweşin:** Wêranbûn, xerabûn
- Hindav:** Sewiye, ser, rade
- Livek:** Livak (Tevger)
- Olan:** Akis (Yankı)
- Pirtûkxane:** Kutupxane
- Rasterast:** Direkt
- Raye:** (Yetki)
- Rewa:** Meşrû
- Timê taybetî:** Timê xisûsî (Özel tim)
- Wexer:** Sefer
- Xelat:** (Ödül)
- Xelata rûmetiyê:** Xelata hurmetê (Şeref ödülü)
- Yekdengi:** (Oy birliği)
- Zarokxane:** Kres

Li Berlînê kampanyaya abonetiye

Em hevkarên rojnameya Welat li bajarê Berlînê silavên xwe yê biratiyê û şoresgeriyê jî bo we rê dikin. Em serfirazî û xebateke heja ji bo we dixwazin.

Hediya me ji bo we sed abone komkirin û ji bo rojnameya Welat e, ku me di bajarê Berlînê de daye pêşiya xwe.

Emê vê kampanyayê heya pîrozkirina cejna Newrozê ku di 20.3.93'an de li bajarê Berlînê pêk tê, bidomînin. Me heya niha 25 abone ji bo şes mehan kom kirine. Em dixwazin peryan kom bikin û di carekê de bisînin. Ew jî, ji bo vê yekê ye ku, em hercar ji bo abonekê 3 markan (hinek dibêjin Tirk 10 markan digirin) nedine bankaya Tirkan. Em divê alîkariya dijmin nekin û hinekî jî obarî, bifikirin. Em hêvîdar in ku, hûn ji bo me probleman dernexin.

Emê listeya adersêya hemû hevalan û bergêya (bedela) razan-

dinê ji bo we rê bikin. Em difikirin ku, di van çend mehên pêşiya me de, şevêkê jî bo alîkariya rojnameya Welat bi muzîk û folklor pêk bin.

Pêşxistîna zimanê "Welat" û standartkirina zimanê Kurdî erkeke neteweyî ye û divê li serê were sekinandin.

Gelê me yê Bakur hêdî hêdî li zimanê xwe xwedî derdikevin, ji me dixwazin ku em qûrsên zimanê Kurdî, ji bo wan vekin.

Heya deh, ta panzdeh hevalbendên Alman niha di qûrsêkî de fêrî zimanê Kurdî dibin. Hejmara wan zêde dibe.

Meheyirin, di nava wan de Tirk jî hene. Em ji wan re dibêjin "Kurdên beriyê" (beriyê-deştê).

Welatparêzên heja! Gelê me û welatê me deng daye. Azadî û rizagariya welatê ne dîr e.

Borzoo - Berlin

Ma ne bes e!

Ey gelê Kurd: Gerek e hûn dost û dijminê xwe nas bikin. Di meha Sibate de civînek di meclîsa TC'ê de çêbû. Ji bo ku "Rêveberiya Taybetî" (Olağanüstü) ji Kurdistanê rabe.

Lê mixabin endamên Partiya Sosyal Demokrat ên di vê civînê de gelek parlamenterên ku bi rayê Kurdan hatine hilbijartin, nexwestin ku "Rêveberiya Taybetî" ji Kurdistanê rabe.

Ewên ku her tim gelê Kurd xapandine û firotine, ji bo malbat û rûmeta xwe, gere vêca em wana qenc nas bikin. Kî ne û çî ne. Bes ji wan bawer bikin êdî ku ew ji zanibin ku, gelê Kurd ne gelê berê ye û ne bêxwedî ye.

Em bang li gelê Kurd dikin û dibêjin bes guh bidin van xayîn û xwefirosan.

E. Akay

Divê Welat rengîn be

Selamunaleykum...

Birêz xebatkarê Welat, ez gelek silavan li we hemûyan dikim. salvegera Welat pîroz be.

Wek ku hûn her roj dibêjin derketina Welat ne bi hêsanî ye. Lê belê em jî êdî vala namînin, bi qasê ku ji destê me bê em texpir nakin. Lewre Welat dengê me ye, dengê gelê me ye, dengê welatê me ye û hwd.

Ji ber ku TC û hizbî-kontra gelê me yê musulman bi seba din dixapînin û li dijî ARGK'ê me şerpeze dikin, divê ku em armanca neyarê xwe yî cellat vala bihêlin. Ma gelo ku em li gelê xwe xwedî derketibûna, qey Hizbullah dika-

ribûna li gelê me serê xwe derxistina û bi TC ve, welatparêzê me şehid bikirana?

Naa... Bes e bila şehidê me yê delal di gorê de bê kêf nemînin.

Wekî din çend xwestinê min ji we heye. Ev jî ku hûn carna wazê melê me yê welatparêz di rojnema me ya neteweyî Welat de, binivîsînin. Vêca bila ser dilê hizbî-kontra baş binepîxe. Lewre ew pir ji dîndarê me diqehirin. Xwestina min î din ku Welat bi rengînî derkeve. Ne heyfa leşkerê me ye ku bê rengînî, wênayê wan derkeve.

Bi saxî bimînin, gelek silav.
Mihemed Nahmedê Avîni

Îro roja hawarê ye

Heya îro min bi zimanê Kurdî nikaribû bipeyivim, binivîsim û bixwînim. Lê ez îro bi zimanê Kurdî nû hîn dibim, ji bo vê jî dibe ku xeletên min hebin.

Dijmin ji bo ku Kurdan ji holê rake, pêşî ziman û çanda Kurdî qedexê kir. Ji bo vê jî em bi zimanê gelê xwe nikarin baş bipeyivim.

Welatê me di bin zilm û zora neyar de dinale, lê li hemberî vê jî, îro ji bo azadiya welat gelê Kurd bi zar û zêçên xwe, bi qiz û xortên xwe, bi bav û kalên xwe, tev rabûne ser piyan. Weke ku pêşiyên me jî digotin: "Jin çûn hawarê, mêr ketin kewarê." Îro roja hawarê ye. Bila çavê şehidên me, li paş nemîne. Sozê me jî Şehîdan re heye ku, serê

me li ber dijmin û li ber dinya alemê careke din natewe û tim û tim wê bilind be.

Bi alîkariya têkoşîna li welat, îro gelê Kurd dîroka xwe nas kir û îro li dîroka xwe xwedî derdikeve. Bi vî awayî jî, li ziman û çanda xwe xwedî derdikeve. Têkoşîna li welat, hem serê gelê Kurd ê tewandî radike, hem jî welatê xwe ji bin zilm û zora neyar derdixe.

Gotina min a dawiyê: Têkoşîna gelê me, me bi xwedî rûmet dike. Ê ku bawariya wî bi têkoşin û bi serxwebûna welat heye, divê ku li dîroka xwe, li ziman û çanda xwe xwedî derkeve.

Ji hemû xebatkar û nivîskarên Welat re serfiraziyê dixwazim.
Mehmet Takir

Ez neçûme dibistanê lê

Welat dixwînim

Merhaba nivîskar, xebatkar û xwendevanên Welat. Berî her tiştî, ez bi şahî û bi dilekî xweş silavên şoresgerî ji nivîskar û xebatkar, xwendevanên Welat re dişînim.

Nivîskar û xebatkarên Welat, ev salek e ku her hefte bi çî zehmetî rojnameya Welat bi me xwendevanan da xwendin. Bi vê zehmetiyê û xebata we, em pîrr kêxweş û dilxweş in. Û ji bo vê xebata we ez pîrr spas dikim. Rojnameya Welat gelek xweş û bi xêr û ber e. Ên ku Welat nexwendibe û nedîtibe, ji vê xêr û xweşiyê mehrûm maye.

Divê em bi hez dest bavên Welat, bixwînin û bidine xwendin. Hinek mirov dibêjin, "Em nizanin Welat bixwînin û tiştêk jê fêm nakin." Li gorî ku ez qet neçûme dibistanê, Welat xweş dixwînim, pîrr jê hez dikim. Bi rastî min berî Welat, Rewşen dixwend. Dema Welat derket min ji Welat pê ve tu rojnameyek nexwendiyê. Ez ji niha ve Newrozê li xebatkar, nivîskar û xwendevanên Welat re pîroz dikim.

Rengîn Ronahî/Amed

Ber bi cepha yekîtiyê ve

Navenda Nûçeyan- Piştî daxuyaniya şerrawestandinê, li hember dewleta Tirk. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan bi Serokê PSK'ê Kemal Burkay re ji protokolek îmze kir. Bi vê protokolek PKK, hêzekeke wek PSK ku berê dijberiya şerê çekdarî dikir, ber bi yekîtiya cepha neteweyî ve kişand. Li aliyê din, ji bo yekîtiya hemû partî û rêxistinên Kurd, di rojên pêşiya me de, li Şamê li darxistina civînekê di rojê PKK, PSK û YNK'ê de xuya dike. Di rewşa lihevkerina van rêxistinên Kurd de, pirsgrêka Kurd di qada navneteweyî de, tê hevîkirin ku wê dewleta Tirkîyê pirr bixe tengasiyêke dijwar. Protokola PKK û PSK'ê ku ji

neh xalan pêk hatiye û bangî dewleta Tirk dike, ji bo ku mafên gelê Kurd nas bike ev e:

1. Lazim e ji herdu aliyan ve, şer bê rawestandin. Gavê yekemîn ê ku PKK'ê avêtîye di vê maneyê de pirr baş û fersendeke dîrokî ye.
2. Li Kurdistanê, divê rêveberiya taybetî û sîstema walîtiyê bê rakirin. Tîmên taybetî û cerdevan lazim e bînin tasfiyekirin.
3. Pêwîst e qanûnê bîngêhîna nû ya ku hebûna neteweya Kurd û mafên wê nas bike, bê çekirin, hemû sazî û qanûnên antidemokratîk bînin rakirin.
4. Efûya giştî divê bê îlankirin.
5. Lazim e serbestiya raman,


gotin, çapemenî û rêxistinîyê bê naskirin.

6. Partiyên me ji tê de, divê îmkana beşdarbûna hîlbijartinê ji hemû partiyên politik ên qedexe ne, bê naskirin.

7. Pêkutî û pesta li ser ziman, çand û dîroka Kurdî, divê ku rabe, îmkana bi zimanê Kurdî perwerdebûnê bê dayîn, radyo û televîzyon weşanên bi Kurdî bikin.

8. Kesên ji Kurdistanê bi kote-kî hatine dîrxistin, lazim e derfeta vegera welat ji wan re bê naskirin.

9. Li Kurdistanê, ji bo pêşvebirina rewşa aborî, lazim e programên ekonomîk ên radîkal bînin pêkanîn.



Li Edenê meşa mezin

Navenda Nûçeyan- Cena-zeyên Şehîdên Newroza 93'an li Edenê bi beşdariya 50 hezar kesan ve hatin hildan. Di dema hildana cendekên Râmazan Çetîn û Vezîr Kurt de, bi yek dengê sloganên "Biji Serok Apo", "Biji PKK", "Biji Meclîsa Kurd", "Şehîd Namirin", "PKK em in, xort herin Botanê", "Em ji cengê re jî, jî sîlehê re jî amade ne" hatin avêtin.

Kurdên Edenê carekê din nişan dan ku, dengê Kurdan bi kuştinê nayê birrin. 50 hezar kesên beşdarvanên cendekên 2 şehîdên Newroza îsal îspat kirin

ku, bi mirinê Kurd zêde dibin.

Cendekên Râmazan Çetîn û Vezîr Kurt di 25'ê Adarê de li ser milên deh hezaran Kurd, hate hilgirtin.

Cendekên wan ên bi alên ERNK pêçayî, bi sloganên ji bo Serok Apo û PKK'ê li ser milan ber bi goristana şehîdan ve hatin birin.

Di dema merasîm û meşa cendekên Râmazan Çetîn û Vezîr Kurt de, hin mebûsên HEP'ê û nûnerên Komeleyên Demokratîk ên Girseyî jî, hazir bûn.

Li ser goristanê, ji bo şehîdên Newrozê, gel bi mebesta rêzda-

riyê deqîqeyek rawest û marşa Ey Reqîp xwendin, di weşartina cenazê Râmazan Çetîn de hêzên dewletê mudaxele meşa cenezayan nekirin. Lê helikopteran meş taqîp dikirin.

Meşên cenazeyan, bê teşqe qediyan, di dawîya meşê de Sekreterê Alikar yê HEP'ê Kemal Okutan wiha axîfî: "Bila ev meşa me ya bêdeng û bêteşqe ji wan kesên ku bi tanq û top, bombe û copan digirin ser me re bibe ders. Weke her carî em dîsa destê xwe yê aştîyê dirêj dikin. Mafên Kurdan ji heye bi awayekî azad bijîn"

Li Stenbolê dîsa înfaz

Polîsên Stenbolê 25'ê Adarê, roja sêyemîn a cejna Remezanê 3 can standin. Stenbolê, Baxçelievler, Ekîbeke Emniyeta Stenbolê li ser îxbara bi "155" girtin apartmanekê. Di apartmanê de 3 kesên ku dibêjin ji Rêxistina Devrimci Sol in, li hember banga polîsan teslim nebûn. Polîsan, ji bo girtina wan dest bi operasyonê kirin. Operasyon 5 saet dom kir. Dawî İbrahim Yalçın Arikan, Avnî Turan û Recai Dînar ji aliyê polîsan ve hatin kuştin. Ji polîsan jî, 3 heb birindar bûn.

Cinayetên kontrayan didomin

Li bajarê Batmanê ku sala îsal jî 2 sedî zêdetir kes lê hatiye kuştin, di 23'yê Adarê de du canên din jî hatin standin. 23'ê Adarê li tenîsta Sînema Mehtabê, welatparezêkî bi navê Abdurrahman Acar bi êrîşeke çekdarî hate kuştin. Eynî roj, li Taxa İpragazê, Felemez Dündar, hinga ku di hewşa mala xwe de rûniştî, bi gulebarankirinekê birindar bû. Li Nexweşxana Dewletê ew jî mir. Cenazên herduyan jî, eynî roj ber bi êvarê ve hatin binaxkirin.

HAWAR

Dilbixwîn

Di vê Newrozê de, li şûna xwînê Berxwedan!

Her kesek bendewarê 21'ê Adarê bû. Rojname, televîzyon... û hemû navendên ajansan ketibûne keft û lefteke mezin. Wê çawa bibe, çawa nebe? Tanq û panzerên dewleta Tirk ên di kolan û taxên Cizîrê, Şîrnex, Amed û Nisêbinê de çi nişan didin, çi temaşgeh û encamê rabe-rî mirov dikin? Delegasyonên siyasî yên biyanîyan û rojnamevanên rojname û navendên nûçeyan... hemûyan berê xwe dabûne gund û bajarên Kurdistanê. Gelo, wê 21'ê Adarê çi bi xwe re bîne? Wê çi guhertinê çêbike? Her kes li bersiva vê pirsê digeriya.

Wateya Newrozê gelekî kûr û fireh e. Çîrok û senaryoyên ku der barê wê de hatine çekirin, nikarin Newrozê bi me bidin naskirin.

Dîrok, bi firehî li ser Newrozê sekiniye. Bi kurtî mirov dikare wate û naveroka wê wisa bîne zimên: Rûxandina nîrê zordarî û koledariyê – wê demê di kesbûna Dehaq de dihate dîtin-, ev rûxandin, rizgarkirina bindestan bi xwe re tine, rizgarkirina bindestan jî bin darê sitemkariyê, aştîyê peyda dike. Aştî jî birafî, dostanî, wekhevî û hevaltiyê bi xwe re derbasî nava gelan dike. Kin were gotin, Newroz van taybetî û xisletan hildigire. Dema ku em Newroza xwe pîroz dikin, em di serî de dostanî û hevaltiya gelan di jiyânê de, didin pêşiya çavên xwe.

Bawer bikin em Kurd neçar in, qeleşnikofan bavêjin ser milê xwe û berê kerwanê xwe bidin ser quntara çîyan. Ji bo xelasiya xwe tu riyên din me nedîtin, di xwespariyê de jîyan tune ye, mirin heye. Ne li mirinê, em li jîyanê digerin, eger mirin be, ev e em jî mirinê westa bûn.

Dijminên me heya niha Newrozê li me kirine dojeh, li şûna pêşkêşkirina gul û gupikan devê tanq û topan xistine sînga me, zarokên me yên nûhatî, avêtine ser sungîyan, gulistan şewitandinê, diwarên xaniyan bi ser pîr û kalên de hilweşandinê... birafî û dostanî di bin panzeran de perçiqandinê. De bibin dozger û biryarê bidin. Emê bi çi awayî cejna xwe pî-

roz bikin?! Gelo, mafê me tune ye em xwe jî qirkirinan biparêzin? Mafê me tune ye em mirovahî, rûmet û jiyana xwe jî bomba û gazên îmhakirinê biparêzin?

Bawer bikin em Kurd neçar in, qeleşnikofan bavêjin ser milê xwe û berê kerwanê xwe bidin ser quntara çîyan. Ji bo xelasiya xwe tu riyên din me nedîtin, di xwespariyê de jîyan tune ye, mirin heye. Ne li mirinê, em li jîyanê digerin, eger mirin be, ev e em jî mirinê westa bûn.


Weke her neteweyekê, mafê me Kurdan jî heye, em xwe û welatê xwe biparêzin. Ev xweparastin mafekî rewa ye (meşrû). Ji ber vê yekê gelê Kurd bi hemû derfet û îmkana xwe ve dadikeve medana mêraniyê. Eger bi dostanî be dostanî, eger bi şer be jî şer. Herdu rê jî, ji bo çareserkerina pîrsa me vekirî ne. Bila dewlet ji xwe re yekê hilbijêre.

Bi rastî ez li wezîrê Tirkan ê hundir ecêbmayî dimînim. Bi çi rengî û kîjan zagonê (qanûnî) Sezgîn bûye wezîrê hundir. Bawer bikin ev kes li gundê me nabe şivanê du bizinan. "Bila terorîst werin xwe teslîmî edaleta dewletê bikin... We tu caran dîtîye ku dewlet bi terorîstan re rûniştine?! Hûn çawa ji me dixwazin em bi çend çeteyan re rûnin? Hûn heqaretê bi me dikin..." ji rojnamevanan re Sezgîn efendî van gotinan dibêje. Tenê pîrsekê jî Sezgîn dikim –mixabin bi Kurdî nizane–: Gelo, heya wê radeyê jî mirov xwe sivik û erzan dike û ji rojnamevanan re dibe pêkenok? Ji xwe kesek gotina te ciddî nagire, tu nikarî bibî berdevkê dewletê jî, tenê ji bo dagirtina valabûnê te derdixîne pêşiya kamereyan.

Di 17'ê Adarê de Serok Apo, bi navê şoreşê daxuyaniyek da: "Ji hêla me ve wê şer heya 15'ê Nîsanê were sekinandin. Eger dewlet êrîşan bîne ser me emê xwe biparêzin." Gelê me ev biryar heya dawiyê pejirand: Newroz bexwîn derbas bû. Lê hema di vê Newrozê de, berxwedaneke mezin hebû. Dîsa alên PKK, ERNK û wêneyên Serok û şehîdan hebûn. Dîsa gelê me li rûyê tanqan, diqêriya û bang dikir: "Biji Serok Apo! Biji Kurdistan!"

Gelo, li dawiyê kî bi ser ket? Kîjan hêzê giraniya xwe di meydanê de diyar kir? Berxwedana Kurdan, lê tanqên dewleta Tirk?..

Kursiyê Yeltsîn dişemite



Serokê Dewleta Rûsya, Borîs Yeltsîn an wê Rûsyayê bi temamî bispêre imperyalîzmê, an jî wê betal bimîne.

Li Rûsya, di rojên dawî de tevlihevî û pirsgrêk zêde dibin. Parlamento li hev dikeve, gəl dîsa li meydanan xwepêşandan li dar dixwe. Yeltsîn dixwaze hemû kes û şopên komunist jî pêşiya xwe rake, jî bo vê jî, bi qerarnameyên nû rayeyên xwe zêde dike. Komunistên Parlamentoyê jî Yeltsîn bi diktatoriyê sûcdar dikin, wî didin mehkemê û li pey, jî nû ve avakirina sistema komunist a Sovyetê ne.

Navenda Nûçeyên Derve- Piştî ku Gorbaçov ji ser kar ket. di quncikê rojnameya Hürriyetê de, jî xwe re karek dît. Gelo Yeltsîn wê di kîjan rojnameyê de bixebite? Di Tercümanê an jî Figaroyê de?!

Rewşa Serokê Dewleta Rûsyayê. Borîs Yeltsîn, bi rastî jî ne baş xuya dike. Yeltsînê-ku bi alîkariya Amerîka û dewletên din ên imperyalîst, sistema sosyalîst a Sovyetê serobino kir û wek Gorbaçov xwe û gelên Sovyetê spartin wijdana imperyalîzmê. niha di astengî û qûştengiyêke pîr dijwar de ye û hêviya wî ya yekane dîsa Amerîka ye. Lê, jî bo danûstandinên xwe bi rayedarên Amerîkî û Ewrûpî re zêde bike. nikare zêde ji Rûsyayê xwe dûr bixe. newêre jî Rûsyayî derkeve derve. Ji ber ku Gorbaçov jî bi wî şekli, jî textê xwe bûbû. Her çiqas kesên derbe li hemberî Gorbaçov çêkirin. dawî serfiraz nebûn û derbeya xwe nivco hiştin jî. Gorbaçov nema textê xwe ye berê bi dest xist û paşî, jî bo rojnameya Hürriyetê dest bi nivîsandinê kir û bi wî rengî jiyana xwe îdame kir.

Xuya ye Borîs Yeltsîn jî, bi tirs û saweke wisa dijî û nizane wê çî bike.

Dewletên imperyalîst jî, soz û peymanên jê re dabûn neanîn cih. Lê dev ji vaadên xwe jî bernadin. Dibêjin kengê te Rûsya û sistema wê %100 kîre kapitalîst hingê emê alîkariya dargî (madî) bidin te. Her çiqas, Yeltsîn li ber daxwazên wan ranabe û bi temamî dîtî û talabên wan dipejirîne jî, dewletên imperyalîst jî bo vê, garantiyê dixwazin. Dixwazin Yeltsîn jî bo ku bi wan bide bawerkirin. gavên berbiçavtir ber bi sermayedariyê ve biavêje.

Yeltsîn jî, jî bo wan razî bike û karibe sosyalîzmê bixe binê erdê, berî daye zêdekirina rayeyên xwe. Ji bo rayeyên xwe zêde bike û her tiştî bixe destê xwe, her roj qerarnameyên nû derdixîne, qanûnê bingehîn ê Rûsyayê tevlihev dike, da ku kesên dijber bêdeng bihêle.

Van rojên dawî, jî ber dijberî û dubendiyên navbera Yeltsîn û komunistên Parlamentoyê Rûsyayê, Rûsya ber bi şerê hundirîn ve diçe. Hin pisporên politîk, wê rewşê wek dawîya Yeltsîn û he-

valbendên wî dinirxînin. hin pispor jî bawer dikin ku wê Yeltsîn, bi qurnaziyê, xwe jî wê rewşê jî xilas bike.

Lê wisa xuya dike, komunistên parlamentoyê û gelê Urûs çavê xwe jî qurnaziyên Borîs Yeltsîn re nagirin. Bûyera hefteya çûyî jî wê eskere dike.

Roja 20'ê Adarê, dema Borîs Yeltsîn qerarnameya bi navê "Rejîma Taybetî" îlan kir, hingê parlamento li hev ket û ev tewra Borîs Yeltsîn wek diktatorî hate nixandî. Alîkarê Serokê Dewletê Alexandrer Rutskoj gote ku, ev tewra Yeltsîn ku kesî nahesibîne, wê bibe sebebê şerê hundirîn. Serokê Mehkemeya Bîngehîn, Valery Zorkîn jî îdia kir ku, Yeltsîn bi wê tewra wê xwe qanûnê bîngehîn îhlal dike, jî ber vê yekê dikare bê darizandin.

Li gor qerara Mehkemê, Yeltsîn, bi pêkanîna "Rejîma Taybetî" qanûnên peymanî federasyonê û hin xalên qanûnê bîngehîn îhlal dike.

Ji bo ku rîya darizandina Yeltsîn vebe, lazim e di parlamentoyê de jî sê paran du par, qerara darizandinê qebûl bikin.

Roja 22'yê Adarê, Borîs Yeltsîn bi qerarnameyekê, kontrola radyo, televizyon û çapemeniyê xiste destê xwe. Ji bo parastina van sazîyên li hember êrişên derve, Yeltsîn wezîfa parastinê da wezaretê hundirîn. Parlamentoya Rûsyayê îdia û gazin kirin ku, xeberên radyo û televizyona Moskojê li gor daxwaza Yeltsîn tê dayîn.

Li Rûsya, roj bi roj betalî û giranî (zam) zêde dibe jî ber vê yekê gel jî, jî rewşa xwe qet ne memnûn tê xuya kirin. wê nememnûnbûnê jî, bi xwepêşandanên protestoyê li hember Yeltsîn nîşan didin. Lê, her caran terefdarên Yeltsîn jî, li hember dijberên wî xwepêşandan û meşan li dar dixin.

Ji bo astengiyên pêşiya xwe jî holê rake. Yeltsîn hêviya xwe jî derve jî nabirre. Bi mebesta alîkarî ji Amerîka bistîne. Yeltsîn Wezîrê Karê Derve Andreî Kozîrev şand Waşington. Wezîrê Karê Derve yê Amerîka Warren Christopher, da xuyakirin ku, wê Yeltsîn bi tenê nehêlin û pê re her cure alîkariyê bikin.

Li gor Serokê Parlamentoya Sovyetê yê dawî Anatolî Lukyanov, ku bersûceki derbeya 1991'î ye, Partiya Komunist pîr bi hêz e, jî ber vê yekê Yekîtiya Sovyetê wê careke din bê afirandin û ekîba Yeltsîn wê bê cezakirin.

Bi dîtina Lukyanov, Borîs Yeltsîn zêde ne bi hêz e û roj bi roj qels dibe, rewşa wî xerab dibê.

GOTIN



Yaşar Kaya

Öcalan û Sezgîn

Min bi xwe heya niha jî bo Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan tişteke nenivîsiye, lê wisa tê xuya, îro çend roj in gotinê Apo di rojnameyên dinê û Tirkîyê de ketine pêşiya gelek beyanetan. Apo berî her tiştî îlan kir û got; "Em êdî şer naxwazin, emê dev şer berdin, bila di vê Newrozê de xwîn naye rijandin. Ezê jî bo wan gotinê xwe civateke çapemenî çêkim û gazî radyo, televizyon û rojnamevanan bikim." Wisa jî kir.

Lê belê ev civata çapemeniya Apo, li dinê bû nav û deng. Gelek rojnamevanên "navdar" çûne wê civînê û civîn çêbû. Mam Celal jî li wê derê bû, anegorî min Apo bi kevîrekî sê çar çivîk kuştin.

1- Pêşiya Newrozê jî dinê re îlan kir ku, em şer naxwazin bila Newroz bê xwîn derbas bibe. Emê gaveke wiha biavêjin, em aştiyê dixwazin.

2- Demîrel û Înönü qet tişteke wiha

nedianîn bîra xwe, tedareka wan tune bû, gelek di tengasiyê de man, dest û piyê wan li hev ket.

3- Şerê ku deh sal dom kir, doza Kurdan li dinê anî cihekî bilind, jî îro pê ve, heq e ev şixul bi siyaset, bi diplomasî, dom bikin.

4- Mam Celal ji Rojava re kifş kir "Hûn bala xwe bidine Apo jî mîna min difikire, êdî hûn mereq nekin. Ev îş, îşê siyasî ye.

5- Derdorê Apo fireh bû, êdî

Hinek dibêjin Apo jî xwe di tengasiyê de bû, tu çareya wî tune bû, li Kurdistanê Iraqê, leşkerê Romê gelek gerîla kuştibûn, bila bê teslîm bibe. Em tişteki pê re xeber nadin, em bi wisa nayêne ser maseyekê, anegorî me ew giliyê çewt in, ev keys û fesal, tu çare nakeve destê tu kesî, jî bo aştiyê elzem e ev destê biratiyê bê girtin û guhê xwe bidine wî dengî.

dikare herê Kurdistanê Iraqê û rîya biratiyê vekir. Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê jî, êdî dikare gelek tiştan hembêz bike û fireh bibe. Bi kurtî em

dikarin bibêjin Kurd gavekî rind avêtin û gelek tişt jî kar kirin.

Lê belê niha berê cepha Demîrel - Înönü û İsmet Sezgîn gelek jî mirovatiyê dîr e. Ji siyaset û diplomasiyê dîr in, mîna zarokên mehela me man. Gelek hewl didin xwe ku siya biçûktiyê bixine ser vê aştiyê û destê biratiyê. Hinek dibêjin Apo jî xwe di tengasiyê de bû, tu çareya wî tune bû, li Kurdistanê Iraqê, leşkerê Romê gelek gerîla kuştibûn, bila bê teslîm bibe. Em tişteki pê re xeber nadin, em bi wisa nayêne ser maseyekê, anegorî me ew giliyê çewt in, ev keys û fesal, tu çare nakeve destê tu kesî, jî bo aştiyê elzem e ev destê biratiyê bê girtin û guhê xwe bidine wî dengî.

Ev roj rojên dîrokî ne, wê carê jî ev fersend jî destê Kurd û Tirkan here êdî paşve nayê. Ev fersend, fersendeke bê buha ye. Rojnameyên Tirkan gelê xwe dixapînin û xwe xapandin, lê belê îro dinya dizane ku, ev meseleya Kurdan meseleyeke zehf mezin e, ev bi aşti neçe serî, ne li Iraqê, ne li Îranê, ne li Tirkîyê êdlayî çênabe. Welatê Rojava jî wê rind dizanin û fikra wan jî ev e. Kurd di dîroka xwe de gavê mezin diavêjin, ev gav jî gavekî mezin e. Kurd sînorê aqil û fehmê çiqas fireh bigirin pêşveçûyîna me, wê ewqas zû bibe.

Şeva Newrozê: Ku ne ji mesaja Serok bûya...

Mazhar Günbat

22'yê Adarê. li Stenbolê bêhna buharê dihate pozê mirov. 21'ê Adarê li paş mabû lê. ços û dilgermiya cejna Newrozê di nava Kurdên Stenbolê de xelas nebûbû. Kurdên ku 21'ê Adarê. roja Yekşemê vir de. wir de. li "Sultan Çiftliği". li Aksaray û li gelek taxên Stenbolê cejna xwe ji ber nehiştina hêzên dewletê. bi dilê xwe nikaribûn pîroz bikin. roja 22'ê Adarê wek fersendek difikirin û nêzîkî êvarê ber bi Zeytinburnu ve diketin rê ku. xwe bigihînin Salona Abdî İpekçi. cihê lidarxistina pîrozkirina Newrozê ji aliyê HEP'ê ve.

Mesaja Serok. dest û piyê Kurdan girê dabû. Nikaribûn bi dilê xwe Newrozê pîroz bikin. Rê li ber wan digirtin. li hember nehiştina hêzên dewletê. çareya yekane zor û livbaziyên çekdarî bû. Kurdên destvala nikaribûn ji cihê û wê de biliviyana û ji barikatên polis û cendermeyan derbas bibin. Bi rastî jî. zehfên Kurdan nizanibûn wê bi temamî çî bikin. Zanibûn çare. çek û zor e. Lê hingê jî. wê ji gotina Serok demeketana?


Ji xortên Kurd yekî ji yên din re digot. "Ku ne ji gotina Serok bûya. ku Serok şer nesekinanda. vê rojê mirov hemû banka û avahiyan dewletê bişewitanda û li ser heft girên (tepevên) Stenbolê

agirê Newrozê bilind bikira wê çiqas xweş bûya."

Ji ber vê yekê. hejmareke mezin Kurd. ber bi Salona Abdî İpekçi ve diçûn. ji bo bi awayekî fermî be jî. Newrozê pîroz bikin. Hem fersenda slogan avêtinê jî wê çebûya di salonê de. Wê têra xwe bigotana "Bijî Serok Apo. Bijî Partiya me. Musa Anter namire û xortên Kurd herin Botanê."

Saet li dora şeşan bi hezaran Kurd li devê deriyê salonê kom bûbûn ku bikevin hundir. Polîsên mêr û jin beşdarvan disekinandin û li ser wan digeriyan da ku. bi xwe re alên kesk û sor û zer û yên PKK'ê nexin hundir. Polîsên jin li paşla jinên Kurd digeriyan û ji pêşira wan kefi derdixistin. Bi sedan kefi û al. li ser beşdarvan girtin û ji wan standin. Hin xortên. paçikên kesk û sor û zer li wan. di ser de hin kincên din li xwe dikirin. da ku kincên wan ên binî neyên ditin. Bi vî şêklî bi dehan xort xwe xemilandibûn. Polîsan deyzek sax kefi û al li ber xwe kom kiribûn.

Min digot qey. bi kesên derbasî hundir dibin re. al û kefiyên rengê neteweyî neman. giş polîsan ji wan standine. Lê dema em ketin hundir. em çî bibînin. hey loo. çawa ku polîs li kesî negeriyabe. ji me pêştir bi herkesî re al û kincên neteweyî hebûn. Salon ji çar aliyan ve bi kesk û



Di Şeva Newrozê de Koma Zarokên Agirî bala herkesî kişandin.

sor û zer û bi alên PKK'ê xemilîbû. Helbet wêneyê Serok jî di destê hin temaşevanan de bilindî hewayê dibûn.

Hîna programê HEP'ê dest pê nekiribû. temaşevanan dest bi "programa" xwe kirin û bi sloganên wek "Bijî Serok. Bijî PKK" salon hejandin.

Di programa HEP'ê de. ji piyasa "Efsaneya Kawa" û koroya zarokan Zarokên Agirî pêştir tiştekî ku zêde bala temaşevanan

bikişîne tune bû. Temaşevan car caran ji kontrola tertîpvanan derdiketin. heta ku ne ji ikazkirina spîkerê ku bi Kurmancî got "Gelî hevalan. gelî hevalên Kurd. hûn nikarin xwe bigirin. ma hûn nizanin "mesaj" çî ye. "mesaj. mesaj" bûya. wê salon li hev biketa. Lê gotina "mesaj" ew xistin rêzê.

Ji destpêkê heta dawî ji çar aliyên salonê tim û tim sloganên ji bo Serok û PKK dihatin avêtin kêm nebûn.

Ji bo ku hezkirina xwe ya li hember Serok û girêdana xwe pê ve bidin diyarkirin. çî ji destê wan dihat. bêyî ku bibin sebebê provakasyonan. dikirin.

Ew lawikê ku xwe ji tribunan avête meydana salonê û bi ala PKK'ê di dest de beziya. lê pê jî tîr nebû. alê li serê xwe pêça. bi rûyê xwe ve dişand û qir dida bi dengê dilşewitî digot. "Bijî Apo. Bijî Serok. Bijî PKK" qet ji bîra mirov naçe.

Li Ewrûpa agirê Newrozê



16'ê Adarê 13 hezar kes li Bonnê meşiyên.

Nûçeyên Derve- Kurdên ku li Ewrûpa dijîn. li gelek bajarên bi awayekî ços û livdar Newroz pîroz kirin û bi belavok û daxuyaniyan bala gelê Ewrûpayî kişandin ser rewşa Kurdistanê. Gelê Kurd ên ku li Ewrûpa dijîn bi agirê Newrozê ve parzûnê Ewrûpayê jî ronahî kirin.

Li Almanyayê. li bajarê Bonnê di 16'ê Adara 1993'an de meşek ku ji 13 hezarî pêk hatibû. çebû. Beşdarvanên meşê bi giştî jin û zarok bûn. Kesên ku beşdarî meşê bûbûn. xwe bi

timtêlên (kiyafetên) neteweyî xemilandibûn. Di meşê de sloganên wek "Bijî Serok Apo". Alikariya çekên Alman bidin sekinandin". "Rê li ber ketîamên Newrozê bigirin" û hwd. hatin avêtin.

Di meşê de gelek pankart hatibûn hilgirtin. Giştî li ser kirinên dewleta Tirk. rewşa Kurdistanê û daxwaziyan jî raya giştî ku rê li ber kirinên dewleta Tirk bînin girtin. bûn. Meş bi axaftina gerilayeke jin ku. bi bernavê xwe Zelal bû qediya. Ze-

lal di şer de mil û piyên xwe winda kiribû.

Li Kolnê di 20'ê Adarê de. li meydana Dom'ê meşek çebû. Ji hezarî zêdetir kes beşdar bûn. Meşvan bi meşaleyên meşiyên. Meşvan bi melîdeyên agirê agirê gurr pêxistin û li dorê govend girtin. Gelek kesên Alman ji tîkildarî nîşanî ve meşê dan.

Li Hamburgê. di 21'ê êvara Newrozê de. nêzîkî 2500 kes bi meşê bi meşale Newrozê pîroz kirin. Meşvanên jin û zarok xwe bi timtêlên neteweyî xemilandibûn. Meşvan ji tîkildarî Strenschanze ta Altonê meşiyên. Girse. sloganên li ser Newroz û berxwedanê avêtin. di rê de jî belavokan belav kirin. Bi pêşana govendê jî. eleqeya kesên biyanî kişandin ser xwe. Nêzîkî 250 kesên Alman jî bi navê piştgiyîyê. beşdarî meşê bûn.

Li Frankfurtê. di 20'ê Adarê de şahiyek ku ji 9 hezarî kesî pêk hatibû. hate çekirin. Şahî. bi rêzgirtina şehîdan dest pê kir û bi zimanê Almanî. Kurdî û Tirkî hate pêşkêşkirin.

Li Almanyayê li bajarên Stuttgart. Berlîn. Bielefeld. Kassel. Hanover wek bajarên jorin

Newroz hat pîrozkirin.

Di 20'ê Adarê de. li Berlînê ji hezarî zêdetir kes bi melîdeyên agir meşiyên. Disa li Berlînê li salona Unîversîteya Teknikê de. ji 4 hezarî zêdetir kes beşdar bûn. di nava beşdarvanan de Alman. gelê Koreya Başûr û Bakur. ji Komeleya Mafên Mirovan a Berlînê mêvan hebûn. Nivîskarê rojnameya me Abdurrahman Dürre jî. di vê şahiyê de axaftinek kir.

Li Fransa li bajarên Paris. Lion Marsilya. Muluş. Mobilyê. Renê. Novers û li deverên din Newroz bi meş. xwepêşandan û şahî hat pîrozkirin. Meş bi meşaleyên pêk hatin Meşa ku li Parisê pêk hat 34 hezar kes beşdar bûn.

Li Swîsre. di navbera mîjûya 16-21'ê Adarê de gelek çalaki hatin kirin. Li Baselê 1500. li Zurichê 1000. li Frieburgê 300. li Lozanê 200 li Solothrm 200 kes beşdarî çalakiyan bûn. Zarokên Kurd ên ku li derdorên bajarên Basel. Zurich û Bernê dixwinîn. 800 kes. der barê Newrozê de mesaj şandin dibistanên xwe.

Livdariya Newrozê tîna xwe da turizmê jî. ji bo boykota tu-

rizmê ku turist neçin Tirkîyê. çalaki her diçin xurt dibin. Çalakiyên Newrozê hê jî berdewamin.

Çalakiyên Newrozê di 13'ê Adarê de bi pêşengiyê ERNK'ê li Avusturya dest pê kir. bi çalakiyên Graz. Viyana û Linzê ku di 20'ê Adarê de hatin pê. domiya. Bi taybetî gelê Kurd ên Başûr bi zêdehî beşdarî çalakiyan bûn. Ev yek bala gelekên kişand.

Di şeva Grazê. de. daxuyaniya Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ku bi çapemeniyê re hatibû kirin. hate nîşandan. Çalakiyên der barê Newrozê de li Avusturya jî bi meş. xwepêşandan û şahiyên çebûn. Meşvan bi melîdeyên agir meşiyên.

Li Danîmarkayê. li Kopenhagen. bi beşdariya 500 kesî ve Newroz hat pîrozkirin. Meş li ber derê Parlemantoya Danîmarka qediya.

Di 20'ê Adarê de. şahiya ku bi pêşengiyê Komîteya Kurd a Qibrîsê hatibû kirin 150 jê Kurd 500 kes beşdar bûn. Şahî li Qibrîs li Nicosia'yê li dar ket.

Ji partiya AVEL (Komunist) mebûs Andreas Pilippou. Ji EDEK (Sosyalist) mebûs Dimitris İlliadis. Cigirê Sekreterê Giştî yê EDEK'ê Takis Hristodulu. Serokê Belediye Egomî. Petras Stilianou. gelek mebûsên kevin. beşdarî şahiyê bûn.

Projeya bi navê GAP'ê (Güneydoğu Anadolu Projesi), projeyeke ku li ser du çemên mezin yanî Dicle û Feradê ye. Di projeyê de sermayedarên mezin, ji bo ji deştên berfireh ên Mezopotamyaya Bakur kelk û sûde bistînin, ev proje hatine amadekirin.

Ev destpêkirina mezin a çêkirina projeyê, ji 13 projeyan pêk tê. Şeş projeyên bingehîn li ser Çemê Dicle û heft projeyên bingehîn jî, li ser Çemê Feradê pêk tê. Bi vê projeya mezin, hem ji bo destxistina elektrîkê û hem jî, ji bo avdana aqarên berfireh û çandiniyê sermayedar dixwazin kêr û súdeke mezin bi dest bixin.

Ji ber vê yekê pêwistî bi 22 bendên avê û 18 navendên hîdro-elektrîkê dibînin ku li ser herdu çeman bîr çêkin. Di dawiya qedandina projeyê de tê bendewarkirin ku, bajarên jêrîn bibin cihên karên mezin. Weke Batman, Şîrnêx, Amed, Ruha, Sêrt, Mêrdîn, Dilûk (Antep) û Pirrîn (Semsûr).

BI HEJMARAN VE GAP

Bê guman di bajarên jorîn de, di pêşerojê de veguherinên mezin dê çêbibin. Heke zêdebûna şêniyên (nîfûs) van bajarên weke salên 1984-1985'an bidome, dê di sala 2000'î de hejmara şêniyên van bajarên bi giştî bigihe 8.600.000'î. Lê her wekî ku tê zanîn zêdebûna şêniyên van bajarên, li gor salên 1975 û 1980'yan de % 37.47 bû. Ev rewş di salên 1980 û 1985'an de gihiyabû % 64, 41'î


Bergehê projeyê 73863 km2 û ev hejmar li gor aqara Tirkîyê % 9.4 'ê. Niha em van hejmaran li ser hin welatan binirxînin.

Projeya GAP'ê bi aqara xwe li gor xaka Belçîqayê %239, li gor aqara Holandayê %176, li gor xaka Urugayê %41, a Koreya Başûr jî % 74 e.

Vêca em bîr ser kombûna şêniyên herêmê. (Li tabloyê binêrin.)

Proja GAP'ê çi ye?

Bêrîvana Dêrsimî



Destpêkirina mezin a çêkirina projeya GAP'ê ji 13 projeyan pêk tê. Şeş projeyên bingehîn li ser Çemê Dicle û heft projeyên bingehîn jî, li ser Çemê Feradê pêk tê.

Tê dîtin ku nirxandina zêdebûna şêniyên heremê (Bajarên GAP'ê) li gor salên 1970 û 1975'an % 27.26 e. Lê di navbera salên 1980 û 1985'an de, ev hejmar gihiyaye % 44, 01 e. Heke mirov li gor zêdebûna van salan lê binêre, her wiha hejmara şêniyên herêmê di sala 2000'î de bibe 8.600.000 û di sala 2010'an de jî de bigihe 13.300.000'î. Li gor nirxandina jorîn, hejmarên şêniyên Tirkîyê jî de bigihe 80.000.000'î. Vêca mirov dikare bibêje ku ji şêniyên Tirkîyê % 16.6 dê li herêma

GAP'ê (Projeya Anadolîya Rojhelata-Başûr) dijîn. Lê li gor jimartina şêniyan a 1985'an % 8.65 li herêma GAP'ê rûdinên. Ji bo veqetandinê jî bi awayê jêrîn e.

- % 43.6 Ji şêniyên giştî ya Belçîqayê
- % 29.7 Ji şêniyên giştî ya Holandayê
- % 42.9 Ji şêniyên giştî ya Urugayê
- % 70 Ji şêniyên giştî ya Koreya Başûr

PROJYÊN LI SER FERADÊ

Bi pêkhatina projeyê, hilbirandina 8242 kw elektrîk û avdana aqarekî 706.208 hektar erd li ber çav tê girtin. Bi qedandin projeyên ku bi Feradê ve girêdayî ne dê 74650 hektar erd bê avdan û 3710 kw elektrîk bê hilbirandin. Bi pêkanîna projeya Semsûr- Kolîk

(Kahta), dê 15005 kw elektrîk bê hilbirandin û aqareke bi qasî 74410 hektar erd bê avdan.

Bi projeya Dilûk (Enteb) ê jî, her wiha dê avdana 89000 hektar pêk were.

PROJEYA DÎCLEYÊ

Bi pêkanîna projeya Dicle- Kiralkizî jî daxwaza avdana 126080 hektar erd tê kirin.

Bi qedandina projeya Batmanê jî dê hilbirîna 885 kw elektrîk û avdana 3774 hektar erd pêk were. Projeya Xerzan jî dê 315 kw elektrîk bide û 600.000 hektar erd pê were avdan. Hezeke elektrîk bi qasî 3830 kw elektrîk dê were afirandin.

Li ser Cizîrê jî divê bê gortin, ku bi qedandina projeyê re, 1000 kw elektrîk bê hilbirîn û cotkar dê karibin

bi hêsani 213000 hektar erd av bidin.

Pêkanîna vê projeya mezin a GAP'ê niha bi xwe re gelek gelemşeyên mezin aniye. Herêm li ser van gelemşeyan gelek serê xwe diêşîne. Gelemşeya herî girîng a avê ye, ji bo avahiyên dorhêlê. Di rastiye de ev herdu çem dibin gelemşeyên navbera Tirkîye, Iraq û Sûriye. Gelek xirecir li ser avê tê kirin. Komara Tirk avê wekî navgîna şantajê li dijî cîranên xwe bi kar tîne.

Ev herdu çemên girîng ku jêdera wan di nava welatê me de ye, her roj, ji berê bêhtir ji aliyê Tirkîyê ve tê bikaranîn.

Ji bo vê yekê, hinek konvansiyon ji hêla NATO û bi taybetî jî, ji aliyê Amerîka ve li ber çav hatine girtin. Ku Kurdistanê di gel Iraq û Sûriyeyê parve bike. Tiştê eşkere ye ev e ku, avên welatê me bîr bikarin, ne ji bo berterefkirina hewcedariyên gelê me, lê belê bi awayeke bê şermane li dijî şiyarbûna gel me dê bê bikaranîn. Di Rojhelata Navîn de, şerê li ser dewlemendiyên welatê me yê xwezayî (tabîî) diyardeyeke (fenomeneke) nû nîn e.

Îro hemû dîrokzan bi hêsani dikarin bibêjin ku, şerê di navbera medeniyetên Babîlî û Asûrî de qewimîne, li ser destxistina jêderên van ava bûne.

Di dawiyê de, bi dîtina min, mirov dikare bibêje ku, projeya bi navê GAP'ê, di mercên niha de, ne bi tenê nîşana pêşveçûnê ye. Lê nîşana siyaseta dewleta dagirker a Tirk e. Projeyên GAP'ê û yê din jî, nîşana siyaseta Tirk in.

Di rastiya xwe de ev proje, navgîna geşkirin û pêşvebirina siyaseta dagirkerî ye. Asîmîlekîrîna civakê bi vê projeyê tê hesabandin.

Çavkanî:

1. GAP'in Esasları, Prof. Dr. Osman Tekinel, Ç.Ü. Zırrat Fakültesi, 1991
2. Rojnameya Cumhuriyet, 19 Kanûn 1991
3. Kürdün "Mahkûs Talihî" ve GAP projesi, Kanûn 1991, Osman Aydar.
4. Kurdistan Rapport, NO/3, novembre/decembre 1991
5. Bilim ve Teknik Aylık Popüler dergi, Cilt 25, sayı 292, Mart 1992

TABLO

Sal	Şêniya GAP'ê	Şêniya Tirkîyê
1970	2.803.166	35.605.176
1975	3.212.531	40.347.719
1980	3.567.628	44.736.957
1985	4.455.886	51.420.757



Jan û eş bi kesên masûm jî derewan dide kirin.

Publius Syrus

Li xwe mukur werin de bi heyranno

Bi rastî biryara Serokê PKK'ê ya Abdullah Öcalan, gelek kesan heyirand. Tu kes vê hêviyê nedikir. Lê Serok bi vê biryara xwe gelek mirovan mat kir. Lewre li gorî gelek PKK, ji aliyê politikayê ve evqas negihîstibû. Nizanibûn, tew pê dernedixistin ku, PKK dê karibe piyê dewleta Tirk bixwe ferekê sotê.

Vêca em zana, ronekbîrên xwe(!) li aliyê din bihêlin. Rayedar, rojnamevan, rewşenbîrên dewleta bavo tew piyên wan li hev diketin. Bê nizanibûn çî bikin. Weke mirovên ku li ser helîna morîstangên rûniştibin, tebatî nedikete wan. Wekê dewarên ku di meha Gulanê de moz dikin, ev camêr jî wisa bûbûn.

Tew daxuyanîyên Wezîrê Karê Hundirîn ê Tirkîyê İsmet Sezgîn, wezîr, serokwezîr, serokên partiyên û rayedarên dewleta bavo: mirov ji kenan zikopiştî dikirin. Lê senaryoyên nivîskarên rojnameyên dewleta Tirk ku, her Tirkek bedelî dinyayekê ye ji bo wan, çî nedigotin. Nizanîm piştî li PKK'ê şikandine, bi kirîna firokên nû, PKK tirsîyaye, nizanîm dubendî

di nava PKK'ê de derketiye. lewma serokê PKK'ê biryareke wiha daye û gelek senaryo û pesîrtengiyên din ên ku PKK tê de diji.

rojnameya Yenî Günaydin Yazgülu Doğan li xwe mukur dihat û digot. "Em xwe neçivçivînin, bi rastî mejiyê me şolî bûye. Em nizanin çî bikin"

Giregir û terpaşeyên dewleta baviko, ji ber bêtendarîkîna vîte vit ketibû wan. Her çiqas dixwazin bi aweyekî giranî bersiv bidin vê mesaja aştiyê jî, sivikî û nehezîrbûna wan qenc dixuya Rayedarên hikûmeta koalîsyona Siloyê Golikvan û Dîkê Elok, beçarêtiya xwe dixwazin, bi nerazîbûna hêzên leşkerî diyar bikin.

Hege xwedêstendî nînin, wê vê maseja şersekînanîyê bi awayekî baş û çêbinixînin. Lê ku bi awîrekî qenc vê biryarê şirove nekin û gavên aştiyê biratiyê navêjin dê li serqunî li erdê bikevin.

Ger xweşmêr û zana hene bila dakevin meydana qeytanê û halanan di xwe bidin. Camêran nav di xwe dan û gazî hefad û ferxên (!) Tirkan kirin. Ez dixwazim dawî bi gotinekê pêşiyên Kurdan li nivîsa xwe binim. Sirke çiqas ar be, denê xwe diderizîne.

Zana Farqînî



Wezîrê Karê Hundirîn ê Tirkîyê İsmet Sezgîn

Lê ew xweşmêrên ku digotin serê Serokê PKK'ê tevlihev bûye bê nîzane çî bike? Piştî lihevrûniştina Serok û Kemal Burkey, şaş û matbûna dewleta têjîkên Osmanî hîn bêhtir zêde bû. Vecarê, ev kesên ku di rojnameyan de pirsan dikirin, dest bi bersivandina pirsên xwe dikirin. Heta nivîskara

zana hene bila dakevin meydana qeytanê û halanan di xwe bidin. Camêran nav di xwe dan û gazî hefad û ferxên (!) Tirkan kirin. Ez dixwazim dawî bi gotinekê pêşiyên Kurdan li nivîsa xwe binim. Sirke çiqas ar be, denê xwe diderizîne.

TEW LO LO...

Doğan Güzel

● Polîtîkaya PKK'ê ya şersekînanîyê rê li ber qetlîamên Newrozê yê nû girt.



TÎR



Musa Anter

Masiyên bi dasî

Ku ez diherim sûka masiyan, tim Kurd tên bîra min. Ji masîna re dibêjin qenc e, ji masîna re jî dibêjin pîs e. Ez difikirim pîs û qencî ya masiyan çî ye? Min nêrî ku, xelk ji masiyên ku goştê wan bê stîrî ne, dibêjin qenc e û rebenekê ku goştê wan bi stîrî ne, dibêjin ne qenc e. Em Kurd jî wek van masiyên bi stîrî ne. Xelk me dixwin, lê ku hebekê em di qirika wan de radibin, dibêjin Kurd ne qenc in. Tewer niha adetek nû derxistine, dibêjin Kurdistan ji Enedolê û Rûmeliyê re bûye barek. Nivîskarên Tirkîyê yê ehmeq hene hesabê vî îşî jî derxistine. Ka va baca (vergiya) Kurdistanê, mesrefa wê dernameve. Ma cahilno erê baca Kurdistanê tune ye, ma em dê bacê jî çî bidin? Baca ji qezencê tê dayîn ehmeqno, ma we qezenc bi me ve hiştiye? Ez xort bûm di 32, 33 û 34 an de, pereyê Kurdistanê yê Osmanîyan bûn, pereyên benqinot li cem me nedibuhirtin. Pereyê me giş zîv û zêr bûn, qurûşê zîv, duqurûş çerxî, yanî çaryekî mecîdî, nîvmecîdî û mecîdî hebûn. Êdî jî rib, nîv û lîrê zêr hebûn. Hikûmetê qanûn derxist, li Kurdistanê Kurd mecbûr bûn baca xwe bi pereyên zêr û zîv bidin. Me carna pereyê TC'yê benqinot peyde dikirin, lê tehsildaran jî destên me nedigirtin. Di sê-çar salan de temamê pereyên me yê zîv û zêr dan hev

Yabo bi xweşkayî em Kurd ne wek we nankor in. Heke we navê û hûn ji me aciz in ne min li jor jî got di riya Xwedê de me berdîn, em xêr û bereketa ku ji we tê me navê. Ma em dê çî derewan bikin, bi Xwedê em bikin nekin, hûn hez ji me nakin.


anîn Enqerê. Sala talî jî, di nava me de zîv û zêr nemabû, lê hingî cendirman bi tehsildaran re li me dixistin, em mecbûr diman, me diçû pereyê zîv û zêr ji Sûriyê û Iraqê bi qeçaxî danîn dida wan. Westê ku em diçûn ji wan re pereyan bînin jî, em

li ser xetê dikuştin. Heta ku hikûmeta Fransa û Îngîlîz bi vê meselê hisiyan, êdî wan jî pereyê Osmanîyan ên zîv û zêr ji Iraq û Sûriyê dan hev (wan jî wek Tirkan kir).

Îsal 70 sal, li Kurdistanê cihê ku karibe bacê bide çênekir. Ji ber zilma hikûmetê, dewlemendê Kurdistanê jî revîyan hatin Rojava. Qezencxane çêkirin û li vir baca xwe didin. Esas ê ku qezencê dike û bacê nade hikûmeta Tirk û donme ne. Hema her sal li deftera bacê binêrin Ermenî, xwediyê Kerxaneyê Manûkyan Xanim ji Vehbî Koç û Sakip Sabancı bêhtir bacê dide. Bacê wiha. Lawo nivîskarên ser ker hûn dibêjin Kurdistan li me bûye bela. Fêda wê tune zerara wê heye, ku em wan berdîn wê ji birçîna bimirin. Lawo di riya Xwedê de, me berdîn em ne di bextê we de. Xwedê bike ji birçîna yek ji me nemîne. Ma mirin ji saxiya bindestiyê ne çêtir e? Lê dîsa jî kerno petrola Tirkîyê, sîfrê Tirkîyê, kroma Tirkîyê, fosfata Tirkîyê, elektrîka Tirkîyê û çiftlikên Serêkaniyê (Celanpînarê) ku hûn jehra mirinê bixwin bi genim, penêr, şîr û goşt we xwedî dike ma ne malê me ye? İca yê we çî heye? Ji bo ku çend otêlên we hene, hûn bi qewadiyê turîstan dihewînin hûn mineta van pereyên qewadiyê li me dikin?

Yabo bi xweşkayî em Kurd ne wek we nankor in. Heke we navê û hûn ji me aciz in, ne min li jor jî got di riya Xwedê de, me berdîn, me xêr û bereketa ku ji we tê me navê. Ma em dê çî derewan bikin, bi Xwedê em bikin nekin, hûn hez ji me nakin. Di Qanûnê Medenî de ji bo berdana jin û mêran sê-çar madde hene. Yek bês e; refî, dudo; qesta can, sisê; nexweşiya ku bêşfa be û a çaran jî, dibêjin halê ku mirov nekaribe bi hev re. Jîn be. İca ez dinêrim ne yek ji van tenê, her çar ketine nav me. Ê ez dinêrim xêra me ji hev re nemaye. İca hûn zanin.

5.4.1992



Kurdistan seranser bi a

Navenda Nûçeyan- Newroza 93'an ji bo gelê Kurd bû destpêka demeke nû. Di vê rojê de, di sa wek her û heta dorfirehtir li hemû deverên ku Kurd lê dijîn, Newroz bi coş û heyecan hate pîrozkirin, di sa alên kesk û sor û zer, wênayên Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan û Kawayê Hemdem Mazlum Doğan, li meydana hatin daleqandin û çiya, gund û bajarên Kurdistanê bi agirê Newrozê ronahî bûn. Bes tevî vê gurr û geşiyê, gelê Kurd ji, ji bo ku bûyerên bi xwîn çênebin û sîleh neteqin, pirr bi baldarî herket kir. Ji ber ku Serokê PKK'ê, ji 20'ê Adarê ta 15'ê Nisanê şer ji aliyekî ve dabû sekinandin. Lazim bû gelê Kurd hay ji xwe bima û nehata provakasyonan, lê diviya Newroza xwe ji pîroz bikira.

Hate dîtin ku, Newroz bi serfirazî û li gor dîrektîf û daxwazên serokatîya PKK'ê hate pîrozkirin. Ev rastî, ji aliyê çapemeniya Tirk ve ji hate qebûl kirin. Manşete rojnameya Hurriyetê ya 22'ê Adarê "Gel Apo guhdarî kir" bû.

Dewletê, hîna rojek berî Newrozê dest bi provokasyonan kir û li Cizîrê xwe ceriband, lê biser neket. Evara 20'ê Adarê li Cizîrê, piştî tarî kete erdê, hêzê dewletê xaniyên Taxa Cudî dan ber roket û berekan (gulleyan), bi saetan kesî nikaribû serê xwe ji hundir derxe. Roket û berekên ku ji avahiya MÎT û ji aliyê malên cerdevanan ber bi Taxa Cudî ve dihatin reşandin, dawî 3 mal şewitandin û gelek mal ji tahrîp bûn. Ew şev heta serê sibê kes dermeket derve.

Rojnamevanên li Hotêla Kadioğlu û heyetên parlamenter û Komeleya Mafên mirovan ji nikaribûn derkevin derve û bipirsîn ka çi diqewime.

Dora rojê, Berpirsiyarê îdarî yê Cizîrê îdîa kir ku, gerilayên PKK'ê malên cerdevanan dane ber fişekan. Lê ji gotinên wî kesî bawer nekir.

Mebûsên HEP'ê Orhan Doğan, Selim Sadak û Reysê Beledîya Cizîrê Haşîm Haşîmî ji hatin Hotêla Kadioğlu û ji rojnamevanan re dan xuyakirin ku, dewlet li pey provakasyonan e û îhtîmal heye ku qetliaman çêbikin.

Li hemû deverên Kurdistanê

Newroz bêteqandina çekan hate pîrozkirin. Li Çend deveran dewletê mudaxele kir, lê ji xeynî Cizîrê sîleh neteqiyên.

Li hin deveran jî dewletê nehişt kes ji hundir derkeve. Ji ber vê qedexekirinê, li Hezex, Mîsircê û Nîsêbinê, rê li ber pîrozkirina cejna neteweyî hate girtin.

Li Hezexê dema gel di malên xwe de rûniştibûn, dewletê marşên nijadperestî (marşa mehterê) bi hêzên xwe dida xwendin.

Pîrozkirina Newrozê li metropolên wek Stenbol, Edenê, İzmir, Mersîn û Manîsa bi başdariya deh hezaran kes hate lidarxistin.

Di dema pîrozkirinê de, dewletê li metropolan bi sîleh mudaxele kir. Di êrişan dewletê yê ser girseyên gel de, li Edenê yek jê zarokêkî 13 salî du kes hatin kuştin, bi sedan kes jî birîndar bûn. Li Edenê û bajarên din ji sedî zêdetir Kurd hatin girtin.

LI KURDISTANÊ NEWROZ AMED

Amedê 21'ê Adarê bi xwepêşandanên Newrozê, bi alên kesk û sor û zer xemilî û sloganên ji bo PKK'ê dihatin avêtin, olan didan. Newroz, li Amedê li deverên Derêçiyê, Ofîs, Bağlar, Melîkahmet, Şehîtlîk, Seyrantepe, Arapşeyh, Yenîmahalle, bi beşdariyeke pirr mezin hate pîrozkirin. Li Ofîs û Melîkahmet, polisên mudaxele kirin û nêzîkî 100 kesî girtin. Li wan taxên din hêzên dewletê mudaxele nekirin. Li Derêçiyê, Newroz ji avahiya HEP'ê dest pê kir. Hatîp Dîcle, Leyla Zana û Sedat Yurtdaş jî, beşdarî pîrozkirinê bûn. Hatîp Dîcle, bi megafonê îlan kir ku, hemû deverên Amedê ji Amedîyan re cihê pîrozkirina Newrozê ye. Bi sloganên wek, "Bijî Serok Apo, Bijî PKK, Bijî Meclîsa me ya Neteweyî, Lêxe gerîla lêxe Kurdistanê ava bike" girsên gel bi alên neteweyî meşîyan û goristana şehîdan ziyaret kirin. Li ser goristanê merşa "Ey Reqîp" xwendin.

Li Bağlarê, zêdeyî 15 hezar mirov bi slogan û alên neteweyî Newroz pîroz kirin. Tevî mudaxeleya polisên, gel belav nebû. Hefta êvarê şahiyên pîrozîyê dom kirin. Li wan taxên din ên Amedê jî çalakîyên Newrozê heta

êvarê bi sloganên ji bo PKK'ê bi rengêkî coş û geş dom kirin. Newroz li navçeyên Amedê, Licê, Erxenê, Bîsmil, Pasûr, Hezro, Çinar û Pîranê bi sloganên PKK'ê hate pîrozkirin.

Li Erxenê piştî şahîya Newrozê Gürkan Şahîn, Erdal Güzel, Metîn Aydın, Şiyar Aslan, Hakan Salîk, Suat Günsel, Orhan Sönmez û yekî bi navê xwe Mehmet (paşnavê wî nehate tesbîtkirin) dema diçûn ber bi mal ve, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin.

Li Pasûrê, hêzên dewletê gel tehdîd kirin û ji wan re gotin, ku hûn bi sloganên Newrozê pîroz bikin, emê we bidin ber fişekan. Newroz li hemû gundên Amedê û yê navçeyên wê jî bi def û zirne, govend û dîlan û kef û şahî hate pîrozkirin.

BATMAN

Batmana ku ev salek e zêdeyî 200 kes lê hatine kuştin û kontrayên dewletê bûne bela serê wê, di vê roja pîroz de, hinek bi ser xwe ve hat, tîrsa ser xwe avêt û cejna xwe ya neteweyî bi sloganên wek "Bijî Serok Apo, Bijî Kurdistan, Bijî PKK, Kurdistan wê bibe tirba faşîzmê" bi awayekî coş pîroz kir.

Şahîyê Newrozê li Batmanê bi Merşa Neteweyî "Ey Reqîp" lê dawî hat.

CIZİR

Di vê Newrozê de, dewlet bi taybetî li ser Cizîrê rawest û ji bo ku gel bi listikên provakasyonan bixape û Cizîrê tevlihev bibe, çi ji destê wê hat kir. Bes, gelê Cizîrê bi serwextî û zanebûneke mezin, rê li ber listikên dewletê girt. Cizîrê cejna xwe ya neteweyî bi sloganên ku girêdana xwe bi Serokê PKK'ê ve nîşan dide, hate pîrozkirin.

Listik û provakasyonên hêzên dewletê û cerdevanan, ji hêla rojnamevanên Tirk û navneteweyî ve jî hate dîtin.

Di dema pîrozkirinê de, timên taybetî êrişî ser rojnamevan ji kirin. Wesîteya BBC xesar dît, di wan êrişan de û hin rojnamevanan jî lêdanê ji destên tîman xwarin.

Hêzên dewletê bi megafonan bangî gelê Cizîrê dikirin ku dernekevin derve û Newrozê pîroz

nekin.

Li aliyê din, heyeta ku ji bo çavdêriya bûyerên Newrozê hatîbû Cizîrê, ji aliyê hêzên dewletê ve hat îkazkirin ku, tiştêk were serê wan dewlet ji wan wê ne mesûl be.

Newroz li Cizîrê, tevî hemû rênedanên dewletê, hate pîrozkirin.

ÎDIR

Roja 21'ê Adarê serê sibehê, ji gundên dora Îdirê zêdeyî pênc hezar gundî ber bi bajêr ve meşîyan.

Hîna negihîştibûn nava bajêr, bi barîkatên hêzên dewletê hatin rawestand. Li ser vê yekê gerilayekî di nava gundiyan de ku navê wî yê kod, hate gotin ku Zekî ye, ji gel re bi dengêkî bilind axivî û wiha got: "Ji ber mesaja Serokê me ya şerrawestandî, em niha Newrozê bi aştî pîroz dikin, lê ku sibê ji me re emrê teqandina çekan were, emê di sa dest bavêjin sîlehan." Vê axaftinê gerîla gundî qayîl kirin û ji barîkatê derbas nebûn.

Gundî ji barîkatê derbas nebûn lê, di destê wan de alên ERNK wiha digotin: "Başûr, Bakur, Rojhilat, Apo Serokê Welat", "Bijî biratiya gelan", "Bijî Newroz".

AGIRI

Li Agirî Newroz bi govend, dîlan û def û zime hate pîrozkirin. Bi mudaxela hêzên dewletê pirr kes hatin girtin. Dawî bi eleqedarîya Mebûsê HEP'ê Zübeyîr Aydar, kesên girtî hatin berdan.

MELAZGIR

Li Melazgirê, hêzên dewletê şeva 20'ê Adarê, li gundê Hesûna mirovekî ji Bazîdê -navê wî Mehmet- dan ber fişekan û kuştin. Hêzên dewletê roja Newrozê nehiştin kes li Melazgirê derkeve, lê di sa jî, cih bi cih Newroz hate pîrozkirin.

TETWAN

Li ser çiyayên dora Tetwanê agirê Newrozê şeva 20'ê Adarê bilind û geş dibû. 21'ê Adarê, ji serê sibehê ve gelê Tetwanê li gelek taxan dest bi pîrozkirina Newrozê kir û hezkirina xwe ji bo PKK'ê bi sloganên diyar kirin. Serokê HEP'a Tetwanê, car ca-

ran bala gel dikişand da ku bi provakasyonan neyê xapandin.

Li Başkale, Muş, Mutkî, Hîzan, Güroymak û Bazîdê jî agirê Newrozê bi dîlan û stranên hate geşkirin. Sloganên PKK'ê hatin avêtin.

WAN

Dewletê ji beriya Newrozê ve, îlan kir ku, girtina kepengan qedexe ye. Lê tevî vê îkazê Wanîyan kepeng girtin û agirê Newrozê geş kirin. Hêzên dewletê mudaxele kirin. Heyeteke Alman piştî bûyerê lêkolîn li ser bûyerê kir.

RUHA

Li Halfetî û nahiya wê Yukari Göklü, Newroz di şeva 20'ê Adarê de bi agirê gurr hate bixêrhatîkirin.

Dora rojê, li Yukari Göklü, zêdeyî 4 hezar mirov bi rengên neteweyî û bi sloganên "Bijî Newroz, Bijî Apo" cejna Newrozê pîroz kirin.

Li Suruç û hemû gundên wê jî Newroz ji hemû caran zehftir bi kef û şahî hate pîrozkirin, sloganên partiyê hatin gazîkirin.

Li aliyê din, li devê deriyê avahiya HEP'a Ruhayê, Newroz bi govend û stranên li ber def û zîrnê hate pîrozkirin.

Li Wêranşar, Sêwrek, Serêkaniyê û Bîrecikê jî Newroz bi awayên cur be cur, bi beşdariya girsên gel ve hate pîrozkirin. Li Wêranşarê, 30 mirov hatin girtin.

Li Sêwrekê bi piştgîriya HEP'ê û partiyên din ên siyasî, zêdeyî 2 hezar kes cejna Newrozê li meydana Cumhuriyetê bi govenda li dor agir, bi sloganên PKK'ê pîroz kirin.


CULEMÊRG

Li Culemêrgê Newroz, şeva 20'ê Adarê dest pê kir. Li Serê çiyayên derdora Culemêrgê agirê Newrozê bilind bû. Dora rojê, ji serê sibehê ve hêzên dewletê dest bi êrişan kirin, da ku gel nikaribe cejna xwe pîroz bike. Lê di sa jî, li gelek taxên Culemêrgê rê li ber pîrozkirina Newrozê nehate girtin.

PIRRÎN

Rêxistina HEP'ê ya Pirîne (A-

a kesk û sor û zer xemilî



diyaman) li Salona Dilanê ya Belediyê, ji bo pîrozkirina Newrozê şevêk li dar xist. Zêdeyî 5 hezar kes beşdarî vê şahiyê bûn. Mebûsê HEP'ê Mahmut Kilinç, der heqê Newrozê de axifî û gotê ku, ev roj roja rizgariya gelê Kurd e.

DİLÜK

Li Dilûkê (Antebê) bi hevkarîya ÖZDEP, HEP, KMM, û hin kom û komên kovarên Sosyalîst li Salona Sporê ya Girti hate lidarxistin. Li gelek taxên Dilûkê jî bi agir Newroz hate pîrozkirin. slogan hatin avêtin.

QOSER

Li Qoserê Newroz jî şeva 20'ê Adarê ta êvara 21'ê Adarê dom kir. Li Parka Belediyê li dora 3 hezar kes, beşdarî pîrozkirina Newrozê bûn.

DÊRSİM

Li navenda Dêrsimê, Newroz bi beşdariya 200 kesî ve hate pîrozkirin. Di dema pîrozkirinê de govend hate girtin, ev slogan hatin avêtin: "Bijî Serok, Bijî PKK, Bijî ARGK, Bijî Newroz" Hêzên dewletê mûdaxele nekirin, lê dema girse belav bû, çend kes girtin.

ELBİSTAN

Li vî navçeyê jî 1500 kes Newroza xwe bi rengên neteweyî, bi slogan û stranên pîrozkirin, li gundên Elbistanê jî Newroz hate pîrozkirin.

LI METROPOLAN NEWROZ EDENE

Dewletê di Newroza îsal de, li Edenê 2 Kurd kuştin, zêdeyî 3 sed kes birindar kirin, ji van birindaran jî yek mir.

Li Edenê, li taxên Denizlî, Gülbahçesî, Hurriyet, Dağlıoğlu, Newroz jî êvara 20'ê Adarê ve dest pê kir. 21'ê Adarê jî, ji 8'ê sibehê ve xwepêşandinên qorsan dest pê kirin. Bi hezaran Kurd li dora agirê Newrozê kom bûn, govend girtin, strîn û bi yek dengê sloganên wek "Bijî Serok Apo, Bijî PKK", "Bijî Meclîsa me ya Neteweyî" avêtin.

Li dora saet 9'an hêzên dewletê komên Kurd ên ku cejna xwe pîroz dikirin, dan ber fişkan. Yek jê 13 salî Ramazan Çe-

tin du kes hatin kuştin. Piştî gulebarankirina hêzên dewletê, xwepêşandanên Newrozê nesekî nîn. Di nava taxên Kurdan de heta êvarê tanq û panzerên dewletê çûn û hatin.

Ji rûniştivanên taxên Kurdan gelek kes jî aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin. Timên dewletê wesîte û xaniyên Kurdan jî pîr tehrîp kirin.

Partî û heyetên ku bi mebesta çavderiyê xwe ceribandin û bikevin nava taxên Kurdan, jî aliyê fîmên taybetî ve hatin rawestandin û nikaribûn bikevin nava gel.

Ji birindaran Vezîr Kort piştî du rojên din mir. Ömer Genç, İsmail Çagin, Zelül Eköz, Alaatin Yalçin, Nuriye Turan A, Kadîr Aras, Eşref Gül, Kazim Altun, Fevzî Altinişik Şehmûs Aydin birindarên xedar in.

Navê birindaran: Celal Eren, Müzeyyen Özkaya, Osman Gök û bavê wî, Hafize Öztürk, Hamîr Öztürk, Habiye Hatay, Nurşen Susal, Cemil Turan, Mehmet Demîr, Sakîne Güler, Hasan Taş, Atiye Yaşar, Çelebî Hilmî, Mahmut Aslan, Samet Aslan, Hüseyin Yıldırım, Mehmet Nesîm Can, Hasîbe Esmer, Lütfî Salman, Abdullah Altındağ, Hasan Gök, Maşallah Dal, Abdurrahman Sağlam, Abdulhalim Aslan, Mahmut Öztürk, Sultan Öztürk, Şehmûs Yaşar, Hîrbef Akgün, Tahsîn Özdem, Hüseyin Gökünç, Besmî Karakuş, Ahmet Tunç, İbrahim Özer, Şehmûs Yeşilgöz, Erhan Tan, Medya Yıldız, Aganî, Yıldız, Erdal Daşan, Şehmûs Altun, Bîşar Güneş, İskender Karabulut, Abdulhalik Ağirman, Abdulgani, Ağirman, Abdulkadir Ayka, Nure Turan, Kemal Doğan, Hüseyin Yaşar, Raif Beyhan, Mahfuz Bakir, Abdulmenaf Altundağ, Hüseyin Bozkurt, Şehmûs Altundağ, Emîne Altundağ, Abdulrezak Altunç, Ahmet Yılmaz, Şefî Çoşkun, Gülay Dağ, Ahmet Güneş, Fahrî Elmas, Sultan Kizilay, Serhan Öztep, Hasîbe Esmer, Mehmet Ali Bozkurt, A Aydın Bakir, Sultan Bakir, Mecit Demîr, Şadiye Bakir, Emîne Kizilkaya, İbrahim Sönmez, Fettullah Ayyıldız, Salih Toy, Almet Sümer, Ramazan Tekin, Hamşe Çelik, Naif Şentekin,

Şemdin Durmaz, Mustafa Ortaç, Mehmet Tunç, Hüseyin Göktaş, Şehmûs Yeşilbaş, Şükrü Akçakoca, Lokman Çaki, Bozan Çaki, İsa Güler, Naif Altun, İsmil Altun, Münevver Baran, İhsan Batur, Murat Bayram, Halîme Bayram, Salih Bayram, Kader Kümük, Halil Timur, İsmail Timur, Ayşe Bayram, Harife Aslan, Tahîr Altuntem, Gurî Cîrey Hüseyin Candan, Fatma Acar, Reşîr Sayan, Mehmet Şirin Tural, Ramazan Yıldız, Ahmet Ergül, Sadîk Yiğit, Şemsettin Yiğit, Fındî Aydemîr, Narin Yiğit û Abdullah Tunç.

STENBOL

Li bajarê Stenbolê li navçe û taxên xwe, bi awayên girseyî gelê Kurd Newroza xwe pîroz kir.

Li Sultançiftliği'yê bi beşdariya 4 hezar kesan ve Newroz di 21'ê Adarê de hate pîrozkirin. Pîrozbahîya Newrozê li Taxa 50, Yilê saet di 15.00'an de çebû. Di vî pîrozbahiyê de alên PKK, ERNK û ARGK'ê hatin vekirin, sloganên wek "Bijî Newroz", "Bijî biratiya gelan" hatin avêtin. Di vî şahiyê de, di navbera hêzên dewletê û welatparêzan de bûyer qewimî, du kes birindar bûn û 15 kes hatin girtin.

Li Esenyurt li Taxa Örneke'ê bi beşdariya 3 hezar kesî ve, Newroz di 20'ê Adarê de bi sloganên: "Bijî aşî, bimire şer", "Bijî Serok Apo", "Bijî biratiya Gelan", "Bijî PKK" bi tilîyan ve hate pîrozkirin.

Newroz li İkitelli'yê jî, bi beşdariya 2 hezar kesî ve hate pîrozkirin. Pîrozbahî di 21'ê Adarê seat 13.00'an de, pêk hat. Lastîk hatin şewitandin, alên PKK'ê hatin vegirtin, govend hate girtin. Sloganên "Bijî Serok Apo", "Bijî PKK", "Kurdistan wê bibe tirba faşizmê" hatin avêtin. Pîrozbahî, nêzikî du saetan domiya û bi bêtesqe qediya.

Li Altınşehir'ê jî, ji hezarî zêdetir mirov Newrozê pîroz kir û slogan avêtin.

Pîrozbahiyên Sarıgazi (1000 kes) xwendevanên Kurd ên YCK li İTÜ (Zanîngeha Teknikê ye Stenbolê) 300 kes, karkerên Su-Ser weke deverên din Newrozê bi coş û heyecaneke mezin Newrozê pîroz kirin. Şahiya ku di

22'ê Adarê de ji aliyê HEP'ê ve hate çekirin, nêzikî 20 hezar kes beşdar bûn. Şev ji ber tansiyonê di nivî de hate qedandin.

ENQERE

Şahiya ku di 21'ê Adarê de ji aliyê HEP'ê ve di Salona Altin Köşk'ê de hate çekirin, 300 hezar kes beşdar bûn. Di şahiyê de alên ERNK'ê ARGK hatin vegirtin. Komên muzikê yên MKM'ê beşdarî şevê bûn.

Ji aliyê din ve malbatên mebûsan jî, di bexçeyên lojmanên xwe de, agirê Newrozê pêxistin û Newrozê pîroz kirin.

İZMİR

Li tanga Eskiçamlık'ê, nêzikî 2 hezar kes bi dadana agir û girtina govendê, Newrozê pîroz kir. Dîsa li tanga Gümüştepe û Yamanlarê 2 hezar kes beşdarî pîrozbahîya Newrozê bûn.

Di şeva 20'ê Adarê de ku ji aliyê rêxistina HEP'ê ve hatibû kirin, 6 hezar kes beşdarî pîrozbahîya şahîya Newrozê bûn. Şahî di bexçeyê gazînoya Ekiç Över de pêk hat. Komên NCM'ê (MKM) Zarokên Agirî û Mezrobotan beşdarî şevê bûn.

İZMİT

Li İzmîtê pîrozbahîya Newrozê ji aliyê rêxistina HEP'a İzmîtê ve hate kirin. Şahî di Salona Sporê ya Atatürk de çebû. Ji 700 kesî zêdetir kes beşdarbûn.

Sloganên "Newroz pîroz be", "Bijî biratiya gelan" hatin avêtin û alên ERNK û PKK'ê hatin vegirtin. Hêzên dewletê gelek tebdîr standibûn. 19 kes ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Dawiyê hatin hînkirin ku, 12 kes hatine berdan.

BURSA

Newroz îsal cara pêşin di 17'ê Adarê de li Unîversîteya Ulu-dağê ji aliyê xwendevarên welatparêz ve, hate pîrozkirin. Ji hezarî zêdetir kes beşdarî pîrozbahîyê bûn.

Di 21'ê Adarê de jî Newroz ji hêla HEP'a Bursayê ve hat pîrozkirin. Komeleya Mafên Mirovan, SBP û kovarên Dîreniş, Emeğin Bayrağı, Özgür Halk, Devrimci Proleterya, Devrimci Mücadele beşdarî şahiyê bûn.

Newroza li Bursayê, bi beşdariya 2500 kesî û bi beşdariya Komên Muzikê, Grup Kizilmak, Koma Botan, Serhat, Koma Argeş gelek bi coş û livdar derbas bû. Pîrozbahî bê tesqe qediya.

MÊRSİN

Li Mersinê Kurd tev bûn yek, ketin milên hev, li dor agir reqîsîn, strîn û bi diruşmeyên PKK'ê hezkirina xwe û girêdana xwe ji bo PKK'ê nişan dan, 30 hezar mirov di şahîya pîrozkirina Newrozê de li Taxa Yenîpazar hatin cem hev û Newroz pîroz kirin.

Di dema pîrozkirinê de mesajên ji PKK, ARGK, ERNK, Abdullah Öcalan û Meclîsa Kurd a neteweyî hatibûn sandin, hatin xwendin. Li taxên ku Kurd lê dijîn, hemû esnafan dukanên xwe girtibûn. Li taxên Yenîpazar û Demirtaş Newroz pîr geş û gurr hat pîrozkirin. Dema mesaja Abdullah Öcalan hate xwendin, dengê mîlet bi "Slogana Bijî Serok Apo" her der dihejandin.

Li Mersinê Newroza ku bi alên kesk û sor û zer yên partiyê di nav sloganên "Bijî Serok Apo, Bijî PKK", "Bi can bi xwîn bi te re ne ey Serok", "An serkeftin an mirin," jî heft seatan zêdetir dom kir.

Sê posterên pîr mezin ên Abdullah Öcalan, Mazlum Doğan û Mahsum Korkmaz li meydana pîrozkirina Newrozê tim bilindî hewayê dibûn. Newroz li Mersinê bê bûyerên girîng qediya.

Li aliyê din li Tarsûsê jî, Newroz hat pîrozkirin lê bi mudaxeleya polîsan 40 kes hatin girtin.

KONYA

Li gundê Çihanbeyli, Gölyazi Newroz bi beşdariya 3 hezar Kurd hate pîrozkirin. Dîsa li gundekî Kulu, Tavşanlı 20 hezar Kurd Newroz pîroz kirin. Di van herdu pîrozkirinê de jî alên PKK û ERNK hatin vekirin.

MANİSA

Li navçeya Manîsa, Turgutlu 20'ê Adarê Newroz ji aliyê 3 hezar kesî ve hate pîrozkirin. Polîs êrîşî ser mêvanan kirin, nêzikî 30 kes birindar bûn. 12 kes jî hatin girtin û berdan.

PÊNÛS



Amed Tigris

Dîplomasî û balansa polîtîk

Her çiqas beş û parçe be jî, me di weşanên hinek televîzyonê de temaşa press konferansa Sekreterê Giştî yê PKK'ê, Apo kir. Press konferansa ku wî di roja 17.3.1993'an de li Lubnanê çêkir. Me bi dengê wî li daxwaz û pêşniyariyên wî guhdarî kir. Medya Ewropayê çihêki mezin û girîng da axaftin û daxuyaniya Apo. Bûyerê, wek nûçe nivîsin. Dîtinên xwe gotin û şîrove kirin. Pirsê Kurd li seranserê dinyayê careke din rojane (aktuel) bû.

Apo bi axaftina xwe gelek babet diyar û zelal kirin. Wî di hêla dîplomasiyê de piştî hikûmeta Tirk şikand. Rê lê girt. Der û dor lê teng kir. Bi tenê ne bi gotin, her wiha wî bi pratîk jî gav avêtin. Ji 20'ê Adarê heta 15'ê Nîsanê bê şert û şût û yekalî şer, da rawestandî. Ev bi serê xwe bûyereke pîrr girîng bû. Cidiyêbûna axaftina wî xwe da diyar û îspat kirin.

Bi vê press konferansê, gelo Apo, PKK û gelê Kurd çi qezenc kirin? An jî berevajî çi wîndî kirin? Dewlet û hikûmeta Tirk çi qezenc kirin an jî çi wîndî kirin? Divê mirov li ser van pirsan raweste.

Hûr û kûr lê binêre. Apo wek şexis, wek serokekî bi ser ket û qezenc kir. PKK, dê wek partî, wek enî û wek leşkerî qezenc bike.

Bi press konferansa Lubnanê re, derî û pencereyên dîplomasiya Kurd ji cîhanê re vebû. Konferansê tesîreke mezin li ser raya giştî ya Kurd, Tirk, Ewropa û ya hemû cîhanê kir. Di warê dîplomasiyê de, ji niha ve xuya dike ku, li Ewropa balans dê bê guhartin. Aliyê Kurdan giran dikişîne.

Çawa?

Wiha... Wî careke din diyar kir ku: "Heger mesele şexsê min be, ez xwe bi paş ve dikişînim. Ez ji navê derdikevim. Doz û pirsê Kurd dikare li derî PKK'ê jî bi hin metod û alternatîvên din bîn çareser kirin. Ev jî, mûmkun e. Em ji her metod û haletî re amade ne. Bes ku mafê gelê Kurd ên neteweyî û demokratîk bîn çareser kirin..."

Ev pileya demokratîk û welatparêziya Apo, da xuyakirin. Bi rastî her serok vê fedekarî, dirustî û nefsbîcûkbûniyê nişan nade. Bi taybetî ew serokên ku xwedî hezaran gerîla bin, bi milyonan alîgir û sêpatîzanên wî hebin qet wiha nabêjin. Ev helwest, encama welatparêziya wî dide diyarkirin.

Ev helwest û rewşa Sekreterê Giştî yê PKK'ê, divê ji hemû serok û berpirsiyarên partî û grûbên din ên Kurdan re jî bibe minakeke berbiçav. Rewşa xwe û partiyên xwe careke din ji nû ve di çav de biborînin. Bi rastî, fedekariyên herî mezin ji wan re dikevin. Ev fersenda dîrokî ya dawî ye. Doza Kurdistanê giran, mezin û girîng e. Divê ev doz bi ser hemû berjewendiyên me de bin.

Beşdarbûna Celal Telabanî ya press konferansê, serkeftin û pêşketineke din e. Ev nişana başbûn û pêşveçûna tîkîliyên Başûr û Bakur in. Yekbûna Kurdan, serkeftinê nêzîktir dike. Bê Bakur, Başûr bi ser nakeve. Bê Başûr jî, Bakur bi ser nakeve. Pêwîst e ku, Başûr û Bakur hemû hêzên xwe bikin yek. Herdu parlamento di nava hevdu de bikelin û bihelin. Niştîmana Kurd yek e; navê wê Kurdistan e. Neteweya Kurd yek e; navê wê Kurd e. Dijmin jî her çiqas çar xuya bin jî, ew yek e û navê wî jî dagirker e.

Bi press konferansa Lubnanê re, derî û pencereyên dîplomasiya Kurd ji cîhanê re vebû. Konferansê tesîreke mezin li ser raya giştî ya Kurd, Tirk, Ewropa û ya hemû cîhanê kir. Di warê dîplomasiyê de, ji niha ve xuya dike ku, li Ewropa balans dê bê guhartin. Aliyê Kurdan giran dikişîne. Dewlet û hikûmeta Tirk ji bo Kurdan jî derî kuştin, koçkirin û çewsandîne (perçiqandîne) tu tiştêkî nafikire û nake. Yanî polîtîka kemalîst a 70 salî her berdewam e. Ji ber ku kemalîzm li ser înkarkirin û kuştina Kurdan hîmê xwe avêtiye û dijî. Heta ku hîmê dewleta kemalîst ji binî ve hilnêweşe, tu carî mafê Kurdan ên neteweyî û demokratîk jî aliye kemalîstan ve, nayê qebûl kirin. "Maf tê standin, naye dayîn."

Kemalîst bi tenê ji metoda zorê fêhm û hez dîkin. Ji derî wê ji tu tişt fêhm nakin. Ew û demokrasî û mirovayî, gelek ji hevdu dûr in û dijberê hevdu ne. Divê welat heta Sêwas û Qeyseriyê rizgar bibe ku wê demê dê hişên wan bê serê wan. Li her derê cîhanê şerxwaz, ji aşî, aramî û xweşiyê fêhm nakin.

Ferhenga bi Kurdî û Almanî

Kerîm Botan

Wan salên dawiyê gelek pirtûk li ser dîrok, ziman, wêje û bi taybetî li ser şerê serxwebûn û azadiyê hatin nivîsandin. Dixuyê ku dê hîn jî bê nivîsandin.

Pirtûkên ku hatine nivîsandin, bi Kurdî, Tirkî Almanî, Fransî, Îngilîzî û bi gelek zimanên din in. Mirov dikare bibêje ku, ev destpêke nû ye. Lê divê em zanibin ku, ev destpêk bi pêşveçûna şerê serxwebûn û azadiyê ve giredayî ye.

Gelê Kurdistan bi hebûn û tunebûna xwe di qadan de dihat munaqesekirin. Lê îro şerê gelê Kurd, bi cîhanê da nasîn.

Gelek rawestandinên Kurd, he ta wan salên dawî jî, ji gelê xwe, ji civaka xwe, ji zanava xwe dûr bûn. Lê îro bi saya tîkoşînê ev rawestandin bi hişê xwe ve hatin û îro dixwazin peywir û vatîniya welatparêziyê û rawestandinê bi cih binin. Lê divê em Kurd zanibin ku, her pirtûkên li ser gelê Kurd tîkoşînê nivîsandin, rastîya tîkoşîna wî ya zanistî nayînin zimên. Em dizanin ku gelek pirtûk bi navê Kurd û Kurdistanê tîkoşînê nivîsandin. Lê naveroka wan li dijî şerê gelê Kurd e serxwebûn û azadiyê ye.

Mebest rawestandîna li ser naveroka pirtûkan nîn e. Ez dixwazim pirtûkê bidim naskirin. Amîrxan bi navê "Wörterbuch Kurdisch" (Ferhenga Kurdî), du



Berga Ferhengê

cild nivîsandîye. Herdu cild jî, ji aliyê Weşanxaneya Sprach der Welt Heuber, di sala 1992'an de, hatiye weşandin.

Herdu cild, ji 75'000 peyvan pêk hatiye. Cîlda yekemîn bi Kurdî-Almanî ye û ji 34'000 peyvan hatiye pê.

Nivîskar di pêşgotina herdu cildan de jî, xwe nedaye naskirin. Lê ji bo çî xebateke wiha pêwîst dîtiye, daye diyarkirin. Xwediyê ferhengan xebata xwe wiha aniye zimên: "Ji salan va gelek pêwîste zelalbûna zimanê kurdî û yeketiya devok û zaravokên wî: ji bo zimanîkî kurdî bilind zelal gi ferma were naskirin li cîhanê, wek zimanê Almanî (b. a ferhenga Duden)

Amedekarê Ferhengan Amîrxan, li ser amedekirina ferheng-

gan jî, di pêşgotinê de wiha dibêje: "Min biryara xa da: ji vê ferhengê pêkbinim û zimanê kurdî bilind zelal bicibînim. Biser pîrraniya devok û zaravoka da zimanê jîni, ferhengî bîngêh dînim û şorên zanistî nu tîxînim. Ev ferhenga, karê heft sala, roj biroje 9-11 seht berdewam..."

Bê guman xebatên bi vî rengî demên dirêj divên. Gelek zor û dijwariyên van xebatan hene. Lê di pêşgotinê de gelek çewtî kemasi bala min kişandin. Mîna: gi, da, xedexe, xa, xandin, minra. Ev mînak jî didin nişan ku, amedekar ferhengên xwe li ser bîngêha devokek heremî çêkirîye. Li gor zimanê nivîskî ku êdî gelek formên peyvan hatine rûniştin, divê mînakên jorê wiha bihatana nivîsandin: Ku, de qedexe, xwe, xwendin, min re.

Xebatên wiha bi zor û gelemşê careke din didin nişan ku ev xebat ne xebatên ferdî ne. Xebatên kom, sazî û sazendeyan e. Her çiqas ferdî bi serê xwe, bi tenê jî xebatên wiha bikin jî, divê di kontrola komîsyonekî di derbas bibin.

Buhayê her cildê: 98 DM

Navnişana xwestinê:
1992 Max Hueber Verlag,
D- 8045 Ismaning
ISBN 3-19-006349-4
Amîrxan: Wörterbuch Kurdisch

Folklorê ma di 'vateyê kay'

J. Espar

Ez na nuştî ma di wazena yew babetê folklorê ma ser o vîndera û ne babetê folklorî ra çend nîmûnan bida.

Verê ki ez behsê tayn xusûsiyetanê nê berhemên folklorîkan bika, ez ganî namedê nebeşa folklorî ser o yew di qalî vaca. Nê babetê rî bi Tirkî vanî, "tekerleme" û bi Swêdkî zî vanî, "em rasma-rasor". La belê ez bi xwi nêzana, ma Kurdî (Kurmanckî, Zazakî, Sorankî) ti ra se vanî. Aw samed ra, mi na mesela ser o tayn embazan rayra qisay kerd û ez çend ferhengan ra zî ewniyaya. Çi heyf ki ne embazan ra yewerî zanayî namey yîni çî yo û ne zî ez ferhengan di rastê çîdê anasarênî ameya. Yanî Kurdî di yê bi xwi estî: la belê namey yîni çîni yo, ya zî ma nêzanî.

La belê nê berhemê folklorîk bê name nêbîni. Tayn embazan nê ware di fikrê xwi va. Ebe gorê bê yew embazî, tîkilî nê babetê folklorî "kay" reyra esto. Cora zî namewo ki kê panî, ganî elaqay yê û kay tê reyra bibo. Ebe inhewa Zazakî namey yîni bi "vateyê kay."

Ma do ewro ra pey nê namî bigurênî. Helbet eke wendoxî, namey yîni yo rastîkên zanî, wa xeyrê xwi hema rojnamedê Welatê rî berşawî!

Nika ma şênî behsê tayn xusûsiyetanê "vatanê kay" bikî. Verî heme çî ganî ma vajî, vateyê kay, kultur psikoloji û zewqê gedan îfade kenî. Nê babetê folklorî di yew fikir ya zî mantiq çîni yo. Tema yîni musterek niya. Kes şeno gelek hadîsanê çiyayan nê tekstan di veyno. Beyntardê nê hadîsan di tîkilî zî çîni yî. Yew mesela re perenî yewna mesela. Kê nişnî yew "vateyê kay" bi yew estanîka folklorîk ya zî yew deyîrî reyra muqayese bikî.

Tiya di çîyo pêamişê vatan o. Heme vateyê ki nê tekstan di estî yew me'na yîni çîni ya. Ge ge samedo ki qalî pêberî, hema şar topêşeno. Vateyê kay, esasdê ahengî vengên ser o payda bi. Peyniya cumlan di hetî ra vatan yan zî kelîman reydi kaykerdîş o. Hewawo ki mi virî yeno, ma bi nê vatanê kay inhe-wa kay kerdîni: Mesela ma vajî, ma yew ka kay kenî, samedo ki ma bizanî kam pol verî dest pê bika, ma vê navet vatîni.

Kelîma peyenî kê di biqedayîni ay polî dest pê kerdîni. Ge ge zî wexto ki tayn kayan di ma nişayîni zorê yewbinan berî, peyenê kam di biqedayîni ayê qezenc kerdîni. Gilangan zî wexto ki yewerî zexeley bikerdîni û samedo ki kê zexelî veci meydan, nê vateyê kay vatîni. Vata peyenî kê di beqedayîni, kaykerdîş mecbur mendîni zexeley xwe qebul kerdîni. Tayn cayan di vateyê kay bi xwi kayî. Ez nika nê "vatanê kay" ra çend nîmûnan dana.

Yek lo, dik lo
Yek lo, dik lo di mazî(1)
Şimşer quto ye, pazî
Hiçî mîçî boyaxçî
Qerme qotik fis pir çî.

(1): Nê vateyê kay, Pîran di vacênî û hewawo ki mi virdî mendî min nuştî.

El el epene
El. el. epene
Say û sur o.
Çepene
Eli kor o
Şorba boro
Pic!

(1): Nê vateyê kay zî, dorma-redê Hênî di vacênî û min hezey vatişê Hemdiye Guven nuştî.

Newroz le Kurdistanda - 2 (Sorani)

Le edebiyatî Kurdîda cêjinî Newroz

Ehmed Şerîfî

MEHABAD- Kurdgel hegîz le hiç kat û çaxêkîda. çeyinî Newrozîyan feramoş nekird û le rêzgirtinî cêjinî Newroz xafil nebûn. Lem yasa dirîneyan wek çekêkî kuşende diji dîjminaniyan kelk wergirtuwe.

Melik Feyselî dûwem Şaî Erâq, yekêk bû le dujminanî ser sextî cêjinî Newroz û rencêkî bê werîda. heta nehêlê Kurdekan. cêjinî Newroz bigirin. belam Kurdan be taybetî rûnakbîranî Kurd. Hergîz koliyan neda û serîxan bo wîstî Şaî Bîrîtanî şor nekird û be rêzewe. hemû salê. sere raî berêweberî aynî cêjinî Newroz. Le ser lutkeî berzî çiyâ Pîre Megirûnîş agirî Newrozîyan debilêsand. Le girdî seywan govendiyan degêra. Lem barewe debê yadêbikin le binaxe darêjêcanî em gelaleye wek Pîrowzor Tewfîq Wehibî Beg. Pîremêrdî Şaîr û Goranî hozanvanî mezîni Kurd.

Le Kurdistani jêr deselati Sûriyêşda. sereraî dijayeti hekumet de gel cêjinî Newroz. Belam Kurdeylî wênderê hemû salê le şarî qamişlî. be hoî piyawetî û cuwamêrî Haco Axa û Şêx Musai Hesari (Cigerxûn) şaîr û nivîserî hêja û mezîne Kurd. Aynî cêjinî Newroz be delalî delwa û berêwedeçû. Be çêşînê ke le salî 1966 da taqimêkî zor le Kurdanî vê giran û tûşî kot û bendan bûn.

Le Kurdistani Turkiyêşda. Paşewei Kemal Etatork û dar û destêi Turke lawekan hetine ser kar û deselatiyan we dest girt. Koşîşêkî bê wîçan luwa heta bergirî le aynî cêjinî Newroz biken û len rêgaye. Kurdekan aludeî ferheng xoîyan biken. Tenanet bo mawei nizîk be 50 sal zimani Kurdiyan yasax kira. Belam Tîrî bê rewitiyan we koçîkgelî xara û berdî gurçû birî çiyâi Kurdistan kewt û ne tenê nekarîn bergirî le yasaî Newroz biken. Belku awirî xebatî Kurdîş bem kacane bilêsedartir bû. Cêjinî Newroz her wisa girî agirî firuzantir aysa. Be çêşnê ke cêjinî Newrozî 1989 buwe gire bilêsan û sertasêrî Kurdistani Turkiyê dagirt. Her le İstanbul û Ankara we bigire heta Mardîn û Hekarî. Bayezîd û Başqela. Van û Amedî. Bedlîs û Erzorom. hemûî kewte ber pîrşengî cêjinî Newrozî Kurd. Xelk û komelanî herawî gel be xopîşandaneî bê wêne hatine meydan û agirî pîrozî Keyûmers û aweyan ji nove dagîrsand.

Le parçe giçkekeî Kurdistani haşa lê kirawî Soviyetî pêşuşda. Kurdeylî. be taybetî Kurde Yezidiyekan. hemû salî agirî Newrozîyan bilêsanduwe. Lem rêgeyêda xebat û berbere kaniyan de gel markîstîstekan û pan-türkîstekanî wênderê kirduwe.

Be giştî detuwanî bîjin. cêjinî Newroz. le naw Kurdekanîda bir-

yaj le daykî niştîman. sîma û bîçmêkî ostureiy sîasi- netewayeti mezîni be xwe we girtuwe.

Serraî parastîni dab û niriyeti dirîni. bote miştêkî polayn diji Kurd xwran û nimad û simbulî ostureiy em cêjine Kaweî Asinger bote simbulêkî xebat û berberekanî gelî Kurd de gel dujminanî. Her lem ruwan-gewe bû. ke Kurdeylî Erâq be Mela Mistefa Barzaniyan debêjî "Kaweî Serdem." Û niho Kurdî Turkiye be Evla Ocelan. Serokî Partî Kirêkaranî Kurdistan (PKK) degot: "Apo Kawe"

Le Kurdistani Erâqda. le salekanî 80 da tendîs û peykerêkî gewreî Kaweî asinger çêdekirê. Ke le destêkîda kutkî giranî Asingerî de bîndira û de destêkî dî keyda keî pejawî Ejidîhak. Em tendîse ostureiy le yekêk le meydanekani şarî Suleymaniye dadendirê. Belam çikawxorani beesî ke çawî bîninî em peyekereyan nebû. Le şewezengêkî tarîka be bomba te-qandiyan.

Newroz û nimadû simbulî ostureiy Newroz yanî Kaweî Asinger. le edebiyatî haw çerxî Kurdîda renganeweyekî gewreî heye. Goran şaîrî mezîni Kurd. Le çameî (Ejidîhak) da be ciwantiyê şewe hest derunî xoî sebareî be Kawe û bedferî Zuhak derdebirê.

Şerko Bêkes. çameî şanoyî mesinewî saî xoî naw nawe (Kaweî Asinger) û basî xebatî Kurd û berxwdanî Kurd diji Ejidîhak dekat.

Şaîr û helbestvanê mezîni Kurdî Eran. Suwareî Eîlxanî Zadeh. Rumanî le ser dilanî çapnekirawî (çekuş we şênî role kujirawî) terxanduwe bo têkoşîni Kurd diji Zuhak. Be kurtî dekarîn bîjin. kemtir şaîr û nivîsarê Kurd heye ke awirî we ser Newroz û Kawe nedabê.

Kurdekan wek hemû gelanîtirî Eranî regêz. le katî geranewei cêjinî serî sal û Newrozî bastanîda. Xewî resim û dab û neriyeti taybetîr û em resim û yasayaneş be rêzewe berêwedeben.

Be rahat. le axirî şewî mangî Reşemeda. le ser berziyê kej û koî runag be ser bajar û şaî û gundda. Le layen lawan û gencanewe. agirî Newroz heldekirê û tişkî pîrozî awirî Newroz berew asiman dewjwê.

Lem buwaceda debê bilên ke

ye. Qile çuwar şemyan çuwar şeme Sûrî.

Axirî çuwar şemoî mangî Reşeme. ke be qile çuwar şeme. kule çuwar şeme be nav bange. Xewî resim û yasaî taybete. Be rahat le şar û gund û bajêrê Kurdistanda. xelk dest le kar û barî asaiyê heldegirin.

Eger hewa xoş bê. pêşketinî gizingî hetawdemîşene der û destan û ser çem û rubacan. deykene govend û dilan û helperkî û çirîni stranên xoş. Katê xori eivarê dexwazê mal awaiy bik û perjîni zêrinî jirdûko ka. Lawan û gencan. pîr û kal agir heldegîrsênin û pêşwazî awirî Newroz deken. Lêreda debê eweş jî bîjim. Heta nizîkê sî (30) sal leme û ber. le bajêrê Mehabadî weşq baw bû ke rojeyî çuwarşemeî hemû hevtuwan. xelk dukan û bazari dadexist û destî le kar û barî heldegirt û delwîne der û deşt û bax û ziyaretan û deyankirde govend û bîzîman baxekani dewr û berî Mehabad ke Ni-

hotenê Nawîyan le naw nawanda Mawetewe û le çêgeyan situngelî simanî Ruwawin.

HEWIT SÎN YAN HEWIT SÎN

Gelo. zor beî here zori Kurdekan le katî aynî Newroz da wesan gilaniyê Eranî musulman. Le ser sifirê Newrozane hewit sin (sirkesincû- simaq- sîr- sewzî- semeni- sêw) dadenên. Lê debêjin ku le rabirduda. Kurde Eyzediyekani şexan û şengar û qafqaz hewit (sîn) niyan le ban xan û sifirê dadena. Ke birîti bûn:

- 1- Şem (nişaneî û simbulî xor û rûnakî)
- 2- Şeraw (nişaneî şadî û xoşî)
- 3- Şihe (henguwîn. nişaneî şirîni û dostayeti)
- 4- Şekiraw (şerbet nişaneî xoşî jiyani be akam)
- 5- Şaiye (tûyî wîşik- guwêz- badam- mîwîj- nişaneî pîr pîti û bireketî çiyâ Kurdistan)
- 6- Şîr (nişaneî xwebijî û xêr û bereketî ajal û patalî Kurdistan)

7- Şimşat (nişaneî ser sewzî xakî Kurd)

Kurde musulmanekan bedegimen le malêda em yasaiye berêwedeben. Belam Kurdeylî xeyrî musulman. le niyayîs û cimxaneda em yasaiye encam deden. Pîrî pîran (Pîr Mug) be xuwardine-wê kemê şerawî hengurî reş (hûme) le kaş şinda em yasaiyan demand.

HETERÊ Û METERÊ

Yekîdi le dab û neriyeti Newrozane heterê û meterê ye. Paş damirkanî agirî Newroz. le layen lawan û gencanewe dest pê dekira. Genc û xortên Kurd deçune ser banî malan û likî piştênîyan le kulane û roçinewe rodehêste xwarê û deyangot:

Helawe û melawe

Ya Xuda kuritan bibê be zawa Sîtekîman bo bixene ew nawe

Wişikerin. yan (kose bebe ya kose be das)

Eweş aynêkitirî çaxî Newrozî dirîn buwe. Be taybetî le layen lawan û gencanewe dekira. Cil û libasî xweyan degorî û karnawal asasa we naw şar û gund dekeuitin. Yekêk le xortekan. ke qoşime û qise xoş bayê. Libasêkî xeyrî asaî deposed û be galte û şoxî û qiseî xoş le malan cêjinanayan desitand

Em yasaye. her le rojî çuwar şeme Sûriyewe dest pê dekat û het sêzide beder dexayenê û lawan û gincan kayê cur be cur be hêlke û le ser hêlke deken.

Hêlke nexişan:

Zorbe malan le katî Newrozda hêlke dekulênin û paşan be tuwêxilî piwaz û roniyas rengameî deken û le katî hamû şoyî zaroyanda pêyan deden. Nûser le Pîre piyawekani Mehabadî jine fituwe. ke goya pêş şerî ewelî çihanî le Mehabad Pîre piyawekî diyan Kurd (Mesîhî) hebuwe be nawî Xalo Elikisan. Demê Xalo Elikisan. le katî Newrozda hêlkeî dekirî daneî be şaiyek û deykuland û rengameî dekirî. paşan dî daneî deda be şaiyek. Katê hoî em mame û kare pîr zerereyan le Xalo Elikisan pîrsî. debêje: "Hoyekê eweye heta em yasa cuwane feramoş nebê û nefeutê."

MÎR MÎRÊN

Yekîdi le dabekani Newroz buwe. Ke be daxewe eîsta encam nadirê û feramoş kirawe.

Sêzide we der

Rojî sêzideî mangî Xakelêwe (2 April). axirî rojî cênayî Newrozê. Lem rojêda hemû xelk dest le kar û barî rojan heldegirê û deçine der û deştan û be şadî û govend û dilan raidebeuwêrin.

Serinc:

Em gotare le pêşda be zimani Farsi nusirawe û le. govani Iransî-nasî- Jimare 3-4. 1992 da çap kirawe. Nuser paşan kirduwe be Kurdî bo (Welat)



Newroz 1993, Cizîr

Zanistî û bîreweriya dîroka me di çi rewşê de ye?

Di van çend salên dawî de, der heqê dîroka gelê Kurd de gelek pirtûk hatine weşandin. Weşandina van pirtûkan jî, bûyereke mezin e. Heya demê berê jî, em dîroka xwe jî pirtûk û nivîskarên biyaniyan hîn dibûn. Ji ber ku, me dîroka xwe nizanibû, nivîsên biyaniyan ên der heqê dîroka me de, rast in an jî ne rast in, me nizanibû. Û heya îro jî em li ser van nivîsên wan difikirin.

Sînco û Bêziman

Heya îro, hûn vê pîrsa jorîn qet difikirin, an jî we qet ji xwe pîrs dikir? Ger bersiva we belê be, gelo li hemberî vê pîrsa jorîn, bersiva we çi ye?

Di van çend salên dawî de, der heqê dîroka gelê Kurd de gelek pirtûk hatine weşandin. Weşandina van pirtûkan jî, bûyereke mezin e. Heya demê berê jî, em dîroka xwe jî pirtûk û nivîskarên biyaniyan hîn dibûn. Ji ber ku, me dîroka xwe nizanibû, nivîsên biyaniyan ên der heqê dîroka me de rast in an jî ne rast in, me nizanibû. Û heya îro jî em li ser van nivîsên wan difikirin.

Ji xeynî Kurdan hemû kesî (kolonyalîst û biyaniyan jî) dîroka Kurdan nivîsandiye û dinivîsin. Tenê Kurdan dîroka xwe ne nivîsandiye. Ya rastî kolonyalîstan nehiştiye ku, Kurd dîroka xwe binivîsin. Kolonyalîst û nivîskarên biya-

ni, heya îro nivîsandin, xwendin û hînbûna dîroka Kurdî, jî Kurda re qedexe bû. Ji ber vê rewşê jî, ev hezar sal e ku, dîroka Kurdan baş nayê zanîn û weşartî ye.

Di gel bi têkoşîna rizgariya neteweyî re, Kurd jî nû ve dîroka xwe diafirînin û bi rastî

nivîsandin, di dawîya van nivîsan de jî, gelek pirtûk hatin weşandin. Xebatên van nivîskar û rewşenbîran, ên li ser çand, ziman û dîroka Kurdî pîrr baş in. Kêmasî û xeletê wan çiqas hebin û zehf bin jî, dîsa jî ev xebata wan ji me xwendevanan re gelek bi fêde bû.

Lê belê, ji van rewşenbîr û nivîskarên re hinek rexneyên me hene. Ev nivîskar û rewşenbîrên Tirk û Kurd, heya îro lêkolîn û lêgerînên xwe çawa çêkirin? Vana tenê bi hinek arşiv û pergeye serpiriştê giştiya Tirk ve agihandin. Ji bo vê jî ev nivîs û pirtûk, gelê me têr nakin û hişê mirovan jî têkilandin (tevlîhev kirin).

Lewre di nava van pirtûkên hatine weşandin de, gelek dubendî hene. Dîtin û şiroveya her pirtûkê cuda cuda ye. Li hemberî vê rewşê jî, em şaş bûne, kîjan pirtûk rast e, kîjan çewt e (xelet e). Belê heya derekê ev rewş tê qebûlîkirin (pejirandin). Lê belê heya kengê ev rewş wê dom bike? Û neteweya Kurdî heya kengê wê van pirtûkên cuda cuda û bi dubendî, bixwînin. Em nikarin bi vê rewşê bîmin. Divê ku em bibêjin bes e; bila hînbûna dîroka me ne bi destê kolonyalîstan û biyaniyan be.

Li hemberî vê rewşê, divê em çi bikin? Ya rastî tiştê ku em bikin ne zor e. A yekemîn: berî her tiştî divê ku, em dest biavêjin dîroka xwe. Di der heqê dîroka xwe de, em bi destê xwe lêkolîn û lêgerînên hê jî kûr bikin û divê ku Kurdên li derveyî welat, lêkolîn û lêgerînên di nava arşivên Rusya û dewletên Ewropa de bikin. Lewre arşivên van dewletan der heqê dîroka Kurdan de, pîrr dewlemend in.

A duyemîn: hînbûn, lêkolîn û lêgerîna dîroka Kurdistan wezîfa hemû kesên welatparêz, nivîskar û rewşenbîrê Kurd e. Hûnê bibêjin em dikarin çi bikin? Berî her tiştî (li gundan li bajaran bav û kalên me yê pîr hene, her yekî ji wan dîroka ji piya ne û çavdêrên dîroka me ne) divê ku em jî, tiştê ku van ditine, çirok û serpêhatiyên ku ew dizanin, em jî, ji wan hîn bibin. Lewre tiştê wan ditiye bûyeren pîrr mezin in.

Di vê demê de, vêca gelê Kurd ji dîroka xwe re ne serguherî ye. Bi têkoşîna xwe re, li dîroka xwe jî xwedî derdikeve. Daxwaza têkoşîna rizgariya neteweyî jî ev e ku, gelê Kurd li tevgera xwe ya neteweyî û li dîroka xwe xwedî derkeve.



nî li gora fêde û bîrdoziya xwe dîroka Kurdan nivîsandin. Ji ber vê yekê jî, nivîsandin wan ne rast e. An jî zehf xelet nivîsandin. Ji xeynî vê

dinivîsîn û li aliye din jî, di nava van 4-5 salên dawiyê de gelek rewşenbîrên nivîskar hatin holê û li ser zimên, çand û dîroka neteweya Kurd

Rojnameyeke Kurdan bi zimanê Ermenî: Botan

R. Cizre

YËRIVAN - Roja 20'ê Adarê li paytexta Ermenîstanê bajarê Yêrivanê hejmara yekemîn a rojnameya Botan derkete ronahiyê. Rojname ji 4 rûpelan bi forma orte (Weke Berxwedan) pêk tê.

Rojnameya Botan wê di serî de, du hefteyan carekî were weşandin û piştî demeke kin, wê bibe rojnameya hefteyî ya siyasî û civakî.

Redaksiyona Botan ji komêke rewşenbîrên Kurd pêk tê. Navên wan jî ev in: Şerel Aşinyan, Karlênê Çaçanî, Emerîkê Serdar, Wezirê Eşo, Ezîzê Ceho û R. Cizre.

Di hejmara xwe ya pêşîn de, di bin nivîsarên "Çima em derdikevin? Çima Botan?" de, wiha tê gotin.

"Di cihanê, Rojhilata Navîn û Qafqasê de, guhertin, pêşketinên mezin çêdibin. Prosesa (pêvajoya) têkoşîna gelan ji bo serxwebûn, azadî û demokrasîyê, bilind dibe. Gelê Kurdistanê vê rojê, li dijî dijminê herî xwînxwar ê gelên herêmê faşîstên Tirkiyê, şoreşa xwe bilind dike. Jixwe şoreşa Kurdistan xwediyê karakterî wiha ye ku, rê li pêşiya helkirina pîrsên hemû gelên herêmê vedike. Bûyeren her rojê pêk tên, îsbat dikin ku, tu alternatîveke din ji xeynî xurtkirina biratî û dostaniya rastîrîn li pêşiya gelên me nîn e.

Ji her herêmekê bêhtir gelên Rojhilata Navîn û Qafqasê bi hewceyê avakirina eniya gelên Yekbûyî ya li dijî dagirkerî û faşîzmê ne. Rojnameya Botan wê bi nêrîna Kur-

dekî bîrewer, welatparêz û militan li ser van pîrsan raweste. Wê herdem informasyonên nû û rast bigihîne xwendevanê Ermenî."

Dîsa li ser rûpela yekemîn gotineke Sekreterê Giştî yê PKK, Abdullah Öcalan bi ser nivîsa "Ermenî bê Kurd nabin. Kurd bê Ermenî nabin" cih digire. Di vê nivîsê de jî ev bawerî tene gotinê: "Mayîna Ermeniyên girêdayîyê Kurdan e, pêwîst e ev herdu gel heta dawiyê bi hev re, bira û dost bin. Ji vê bi şûn ve, em bawer in wê têkiliyên nû û rast di navbera gelên me de werin çêkirin."

Di rûpela dawî de, car din ji analizên Serokatiya PKK'ê yê meha Cotmeha 1987'an nivîseke dirêj li ser welatparêziyê hatiye weşandin. Li



Rûpelê rojnameya Botan ê yekemîn

ser rûpelên 3 û 4'an gelek xeberên din cih digirin. Weke hemû welatên Sovyeta berê, bilançoya şerê Kurdistanê ya sala 92'an û gelek xeber û informasyonên cuda cuda hene.

Rojnameya Botan bi tipografîyeka xweşik û wêneyên paqij der tê.

Navnîşana Botan ev e: Vranşapûh Arkayî 24, No: 15/A Erivan/Ermenîstan Tel-Fax: 7-8852-530995

Pênûseke ji şûr tûjtir - 2

Jiyana Balzac a hunerî

Murat Ergin

Engels ji bo Komediya Mirovahiyê ya Balzac wiha dibêje. "Xwendina vê berhemê li ser civaka wê demê. Li ser babeta aborî, ji kitebên ekonomîst û îstatîstîkvanan zêdetir tişt dide min."

Balzac bi hemû hêza xwe ji bo bûyeran sift bike dixebitî. Bûyeran: di bêjîngê de derbas dikir ên ku bêkêr di bêjîngê de diman incax ên ku xwerû. bi mane û sift in ji bêjîngê. derbas dibûn. Sûn ve Balzac van şêklên ji hev bela wela bi destên xwe yên germ li hev bir û anî û ew sift kir. Balzac weke Napoleon bi merkezbûna Parisê ve Fransayê kir hakimê dinyayê. Ji nav derdora Parisê hinek mirovan ji hev cuda kiriye: wek ên esil, hunermend, ên karker û yên zanyar.

Qehremanên Balzac wek dilopên beranê kesên xwerû ne. îhtirasên wan faktorên bêilave, trajediyên wan ji bûyerên di halekî sift de ne.

Ji bo Balzac tenê tiştek heye ku rast e. û nayê guherîn: Vîna (îrade) bêhempa.

Mirovên bi nîzam bala Balzac nakişînin. Tenê mirovên ku bi her tiştê xwe bi hemû sinêrên xwe, bi hemû laşê xwe û fikra xwe, çî bibe bila bibe di jiyana de, kesên ku xwe didin tiştêkî tenê ne: Evîn, timahî, pere, cesaret, zexelî, politîka, hogirtî... Mirovên wî sembolên îhtirasê ne. Di romanên Komedyaya Mirovahiyê de, tîpên xortên bêrehm û bi vîn (Vaturin Rastignac) dahiyên ku qabiliyetên xwe vala xerc dikin, orîspiyên dilgerm, dergustiyên dayik, kesên di mal de mane, bal dikişînin... Kesên Balzac, herdem di nava civakê de tên xuyakirin.

Li gorî Lukacs, sirra realizama Balzac di yekkirina tîp û kesan de veşartî ye. Kesên Balzac hem tîpên nûnerên dinyadîtina demê û hem ji kesên ku taybetiyên xwe diparêzin in.

Qabiliyeteke Balzac a bêhempa ya afirandinê heye. Balzac ji bo berhema xwe (Komediya Mirovahiyê) ji du hezaran zêde tîp afirand. Heryekî ji van li gor xwe xwedî taybetî û kesanî ne.

Di her yekî de felsefeyek veşartîye. Vautrin anarşîzmê, Madam Morstaufer erdemê, Goriot fedakariyê, Grandet timahiyê, Rastignac ji îradeyê temsîl dike. Ev du hezar kes ji yên ku em her roj di kuçeyan de rastî wan dibin reeltir in û jiyaneke gelek bi hêz didomînin.

Bi Balzac re, berî her tiştî hêza çavdêriyêke bêhempa heye. Ew di berhemen xwe de di merhaleya amadekirinê de, der û dor û dîroka ku qehremanên wî jê hatine bi dirêjahî taswîr dike. Cihan, avahiyên, kuçeyan, xaniyan, nava xaniyan, esyayan, cilan taswîr dike. Kincên kesan bi anatomîya wan ve taswîr dike. Kesan pêşî bi ser û rûyên wan, mimîkên wan bi xuyakirina wan tîne zimên. Sûn ve der-



Karikaturekî Balzac. Di 1838'an de di Charivari de derketiye.

basî dîroka wan dibe û eslê wan, karakterê wan, dîtina wan, dinyaya rewsa wan î madî, çîna wan, zewqa wan taswîr dike. Balzac gava van çavdêriyan dike wek zanyarekî hereket dike. Lê incax dinyaya Balzac ne tenê bi çavdêriyê ye, ewqas ji xeyalî ye.

Balzac, li vir û wir digeriya û her tiştî hîn dibû. Taybetiyên tevlihev ên kuçeyan weke ku kitêbekê bixwîne ji ber dikir. Gava xaniyekî bidîta zanibû ku, ev xanî ji aliyê kî û ji bo kê hatiye çêkirin. "Bi rastî ji Balzac xwedî zanîneke ansîklopedîk bû. Buhaya tabloyekê çîqas e, buhayê hektarek mîrgê çîqas e, parçeyek ji dantêlê, faytonek, xulamêk bi çîqasî mal dibe zane"

Weke Taine ji dibêje: "Ew ji Shaekspær û bi vir ve depoya herî mezin a ku hafizayên mirovahiyê tê de veşartî ne."

Mirov dikare qehremanekî Balzac di romanên cur be cur de an bi hatina wî an ji bi dîroka wî bibîne. Mimîkûn e ku, qehremanekî di romanekê de di pêş de be. Di romanekê dînde bi rola xwe ketibe paş.

Gera qehremana ya ji romanekî ji romanekê din, ji xeynî bi zarî-

kirina jiyane ne tiştek e. Balzac li dijî ku qehremanên xwe di romanekê de hepis bike wan berdide nav jiyane.

Balzac di warê romanên de, nûnerê realizmê yê herî mezin tê qebûlîkirin. Realizma Balzac ji senteza naturalîzmê û romantîzmê tê. Balzac gava bûyeran, objeyan û kesan çavdêrî dikir wek zanyarekî analiz dikir. Lê ev nîşan nade ku Balzac naturalîst e.


Balzac van çavdêriya tev ji bo mirovan bi derdoran wan baş têbigihîje, dikir. Realizma Balzac a civakî ji alî naturalîstan ve weke zalo û "Herdu Birayên Goncurtan", hatiye rexnekirin. Ji ber ku di dema bilindbûna kapîtalîzmê û şoreşa senayiyê de Balzac li ser tîkiliyên kapîtalîst û karkeran nexebitîye. Li dijî vê wext û xebata xwe tev daye ser spekulasyonên finansê.

Lê di sa ji weke ku rexnegir tev ji dibêjin "Balzac, tesîra rihê mirovahiyê li ser kes û bûyeran nîşan daye û bûye Shaekspærê romanê."

Çavkanî: Lukacs: Estetik fikrî yên Dinyayê / Anver ziss: Estetik / Ansîklopediya Ana Britannica / Ansîklopediya Meydan Laurusse

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Hezretî Muhemmed (E.S)

Divê mirov, qenc û baş bizane ku Hezretî Muhemmed hem pêxember, hem şoreşger, hem jî serok û rêber bûye.

Pêxember bûye, ku quwet û îlhama wî jî, Xwedê dabûye, li ser nav û hesabê wî xebat kiriye û lebitiye.

Şoreşger bûye, ku li hemberî zalim û neheqan, neheqî û zilma wan rabûye û serî hildaye, bi wan re ceng û şer kiriye, heq û mafên mezlûman parastîye, alîkariya wan kiriye, bindest û belengazan parastîye, aza kiriye; yanê, bi kurtî, cenga azadî û serfirazîtiyê kiriye, li dijî zilm, zor û koledarîtiyê derketiye.

Rêber û serok bûye, ku riya rastî û duristî û heq û edelet û wekhevîtiyê û mirovatîyê daye nîşandin û pêşewatî û rêberîtiyê kiriye, serleşker û cengawer bûye.

Ew kesên ku bi rastî, pêxemberîtiya Hezretî Muhemmed û heqîtiya dîne wî (ola wî) qebûl dikin, bawerî pê tînin, divê ku hem terefdarê heq û mafên hemû kes û hemû gelan bin, hem jî, alîkariya hemû şoreşgerên azadî û rizgariya hemû însan û gelan bikin. Li hemberî hemû zalim û hemû cureyên zilm û neheqîyan rabin û qebûl nekin, welew ku ew,

Ew kesên ku dibêjin: "Em musulman in û dawa şerîet û îslamiyetê dikin", eger ku bi rastî musulman û şerîetxwaz in divê ku, beriya her tiştî, hemû mafên Kurdan ên însanî û demokratî û neteweyî (millî) û çandî û civakî û rêzanî, qebûl bikin. Hebûna gelê Kurd û welat û serxwebûna wan, nas bikin.

neheq û zalim, bav û bira û gel û hikûmet û dewletên wan bin, ronahiya çavê wan bin jî divê ku hemberê wan derên û alîkariya heq û mezlûman bikin. Çawa ku Hezretî Muhemmed jî wilo bûye û wilo emr û ferman jî kiriye. Li dijî ap û xal û eqrebayên xwe yê

zalim derketiye û bi wan re ceng û şer kiriye.

Ew kesên ku dibêjin: "Em musulman in û dawa şerîet û îslamiyetê dikin", eger ku bi rastî musulman û şerîetxwaz in divê ku, beriya her tiştî, hemû mafên Kurdan ên însanî û demokratî û neteweyî (millî) û çandî û civakî û rêzanî, qebûl bikin. Hebûna gelê Kurd û welat û serxwebûna wan, nas bikin, alîkariya şoreş û serhildana wan a ji bo azadî û rizgarî û mafên însanî bikin û li dijî gel û hikûmetên xwe yên ku, heqên Kurdan xesb kirine, welatê wan îşxal kirine, derkevin û alîkariya Kurdan û şoreş û serhildana wan a li dijî zalim û dagirkeran (kolonyalîstan) bikin. Paşê bila bibêjin: ku em musulman in û birayên hev in, piştî ku wan hemû mafên Kurdan nas kirin, Kurd jî, wekî hemû gelên aza bûn, wê demê ji wan re bibêjin ku em jî musulman in, hûn jî musulman in, musulman hemû jî birayên hev in, di hemû heq û mafan de wekî hev in, divê ku li hemberî hemû zilm û neheqîyan, alî hev bikin tu mêl û ferqan nekin, bavê me jî neheq be, em bi hev re li hemberî wan derên, nebêjin ku ew, bavê me ne, gelê me ye, hikûmet û dewletên me ne.. Ku musulmantî û biratiya bi rastî wilo dibe, wekî din xapandin û virr û sextekarî ne. Ew kesên ku îro dawa musulmanîtiyê û şerîetê dikin û li dijî Kurdan û şoreş û serhildana azadî û rizgariya gelê Kurd, derdikevin alîkariya hikûmet û dewlet û gelên xwe yên dagirker û neheq kirin, di camîyan de jî, ji leşker û hêzên wanê zalim re dua dikin. Ew hem virrek û şoven û zalim in, hem jî, ne musulmanê bi rastî ne. Sextekar û minafiq in, tolaz û yobaz in, musulmantî, bi sextekarîtiyê û durûtî nabe û nameşe, divê ku rastî û wekhevîtiyê be.

Bi kurtî, divê ku ew hemû maf û tiştên siyasî û civakî û însanî û çandî û neteweyî û demokrasiyê, ku ji gelê Tirk û Erebb û Faris û gelên din re hene, ji gelê Kurdan re jî hebin, bîn naskirin û dayin. Paşê dawa biratiya îslamî bête kirin. Ji bilî vî, virr û xapandin û sextekarîtiyê û minafiqîtiyê, biratiyê divê ku bi rastî be...

Rexne û rola wê

Memoyê Dekşûrî

OKRAYNA- Rexne, di jiyana neteweyan de risteke gewre (mezin) pêk tîne û dibe sedemên pêşketina wê. xelaskirina ji eşên mezin, bedewkirin û xemilandinana bejn û bala wê.

Rexne, ji ber şaşî û kêmasiyan dertê holê. Rexne dixwaze, kêmasî û şaşiyên rast bike, valahiyan dagire. Bi taybetî jî, di berhemên ilmî de dixwaze rola xwe bileyze. Rexne, divê bi qanûnên zanistî, li berheman binêre û şaşî û çewtiyan berbiçav bike. Di vir de tê xuyakirin ku, rexne bi xwe, avakirin û vegerandina tiştên windayî ye.

Mînak: di civaka ku di bendên koletiyê, el û olperestiyê de, dor lê hatibin girtin, bêhn û nefes hatibe lê çikandin û tu pencere jê re nehatibe vekirin, danûstandin qut bûbe, ji hawirdorê wê nikare ji vê rewşa kambax ji xwe re rizgar bibe. Ji ber vê yekê rexne divê armancên piroztiyê pêk bîne.

1. Rexne, divê li ser bingehêke ilmî û objektîv be. Ne girêdayî berjewendiya şexsî, olî û partîgirî be.

2. Rexne, divê li gorî mercên civakan û li gorî derfetên çêkirin û afirandinê be. Yanî divê em civaka xwe beramberî civaka Swêdî an jî civateke pêşketî nekin.

3. Rexnegir divê di nava kar û xebata afirandinê de be. Ne li derveyî civakê be. Divê rexnevan beşdar be, ne çavdêr be.

4. Rexne divê werin qebûlkirin. Ji bo meseleya neteweyî divê bi giştî li ser civaka me bin. Ne li ser hîs û pûçên me bin.

5. Rexne, divê bibin kevîrên enîşka avahiya neteweyî û stûna movikê ya piştî civakê.

6. Rexnegir pêwîst e, her tim alternatîv pêşkêş bike û bedela şaşîtiyê ava bike. Alternatîv jî divê di merc û egerên welatê me de û li gorî derfet û keysên mirov û tevgera me be.

Civateke bêrexe, dawiya wê xerab e û guherînen tê de kêmtin. Meşa wê meşeke kêmtin e û hêdî hêdî ye.

Nepejirîna rexneyan dibe kevneşopî zemanên derebegiyê û berjewendiyeke paşvemayîne

Rexne, ji ber şaşî û kêmasiyan dertê holê. Rexne dixwaze, kêmasî û şaşiyên rast bike, valahiyan dagire. Bi taybetî jî, di berhemên ilmî de dixwaze rola xwe bileyze. Rexne, divê bi qanûnên zanistî, li berheman binêre û şaşî û çewtiyan berbiçav bike.

ye. Bi taybetî îro di hemû rewşa çanda me de, ev yek tê xuyan û sedem, ji sedemên jixwerazîbûna xwe ye. Ev rewş jî koletiya kesani dide eşkerekirin. Tu dibîni ku, her kesek bi xwe peya ye, yan bi eşîr, bi navçeyan xwe ye. Îro di nava civaka me de herkes bûye xwedî pareke siyasî, olî, edebî û exlaqî.

Ev jî eşeke pîrr giran e di civakê de. Dibe ev rewş ji ber dagirkeriyê be. Xweparastina ji êrişên dijmin û neyar be. Lê îro ev rewş, kelemeke mezin e li pêşiya yekkirina gel û xaka me, pêşxistina kultura me. Ev eger (faktor) jî, girêdana bi gundîtiyê ve ye û dîrxistina ji şaristaniyê ye.

Weke me diyarde belû kir û ronahiyê avête ser qurçikên reş û tarî, divê rexnegir xwedî zanebûneke bilind be. Welatparêzêkî/ê bêhempa û parçeyek jî nasê gel be. Li vir nêrînen kesani pûç in, bê rûmet in. Divê rexne, ji berpirsiyareke dîrokî pêk were û ne li gorî hîs û niyazên rexnegir be. Armanca rexneyê, rastkirina şaşî û kêmasiyan, dagirtina valahiyan û pêşvebirina civakê ye.

Metoda Rexneyê: Divê rexne, ilmî be û li gorî qanûnên zanistiyê be. Jêder û jêzayên rexnegir, divê rexnegir gel û kultura xwe ya berxwedanî û canfidayî li ser xaka Kurdistanê zanibe, nasê welatê xwe be.

Li gorî xalên jorin divê rexnegir erk û delametên xwe pêk bîne û ronahî bide vê riyê.

Me bi kurtî çend norm û standartan bi şeweyeke (awayekî) giştî raxist ser rûyê rûpelan. Lê ji bo gelsa neteweyî û çarenûsa neteweyî divê rexne çawa, an jî pîvana rexnegir wê çibe û çî deyne ber çî? Dema rexnegir şaşî û kêmasiyan bibîne wê bi çî çavî li bûyer û diyardayan binêre?

Di vir de em dikarin ji bo alîkariya rexnegir çend xalên girîng bibêjin.

1. Ger li welatekî an jî li mile-



tekî nemafiyeke (neheqiyeye) dîrokî lê hatibe kirin, ev yek dibe sebebê ji hev parçebûnê, belavbûnê û qutbûna laşê millet.

2. Zordayîna li dîrokê: tiştê bi zorê ji navê hatibe hilanîn, bi zorê jî vedigere.

3. Biryardayîna mafê çarenûsî.

4. Mafê dewlet çêkirine û azadiya welêt.

5. Bîrdozîyeke (îdeolojiyeke) neteweyî, ku ji êlgirî, olgirî, herêmgirî û hwd. dûr be.

6. Pîvana xebatê, rakirin û komkirina gel a ku ne bi dirûşmeyên şîrîn û fantastîk e.

7. Ji dîrokê derxistina gelek nimûne û mînakên berçav. Û di şertên îroyîn de bikaranîna van tecrûbeyan.

8. Tevgerê şaristanî (medenî) û rewşenbîrî pêwîst e. Ji ber ku, şerê me ne şerê gundiyan e, lê berevajiyê vê yekê şerê ba-

jarvanî ye, hemdem e.

9. Tevger divê neteweyî be û hemû qat û çînê neteweyî bihevine.

10. Xebat divê rêk û pêk be û li hember dîrokê dîtina xwe bike pîvana karê xwe.

11. Pîvana herî mezin divê di hemû waran de, pêşketin be. Lewre rawestan, avê dibe ser aşê dijminan.

12. Xebateke bi hîs û meji divê bê kirin. Bi hêrsê tiştêk nameşe.

Li gorî xalên jor ku em rewşa welatê xwe deynin ber hev, emê bibînin ku pîrr tişt hevbeş in û tevgera dewletçêkirinê ya ku îro di şexsiyeta PKK'ê de şîrî dibe ji me re jî gelek peywir û berpirsiyariyan tîne. Di domana dîroka bi rûmet de, divê em helwesta xwe zelal bikin. Rê hatiye naskirin, bê terefî û bêalîgirî, îro ji bo me gelek xerab e.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Keça agir. Di Newroza 1990'an de, xwe li ser bircên Diyarbekir şewitand. Di wêne de tê dîtin
2-Şepe/ Zîtik, pihîn 3-Sembola Nîkelê/ Meha Newrozê/ Selahiyet
4-Navê rêxistina têkoşerên Îrlandî/ Sembola Îrîdîûmê/ Edat 5-Dengbêj/ Li Tirkîyê navê saziyek ku li madenana digere 6-Zûl, terk/ Baneşanek
7-Bi Erebi qencî 8-Hoy, şert
9-Vexwarinek bi alkol, şerab/ Gopalê Musa 10-Di Sedrêncê de, dawiya lîstîkê/ Dijberê birinê

Serejêr: Zanîngeh, unîversîte
2-Êlîti/ Qey 3-Cinavkek pirsiyarî/ Filozofê ku hêza bilindkirina avê kifş kiribû 4-Bi Erebi pêkanîn/ Navê Amûrek muzîkê 5-Olperest 6-Yek ji komarên Sovyeta Kevin 7-Bi Îngilîzî hewa/ Notayek 8-Kinnivîsîna lître/ Şofêr 9-Kort, çal 10-Hewar
11-Keştiya arizî 12-Li hemberê sûcê tê dayîn

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ
Çeperast: 1-Mazlûm Doğan 2-Îris/ Ard/ Hîn 3-Rende/ Aere 4-Anî/ Vîn/ Ango 5-Ta/ Tîr/ Fîgan 6-Xinamî 7-Ber/ Den 8-Penaberî 9-Krîlî/ Ek 10-Kamîkaze
Serejêr: 1-Mîrate/ PKK 2-Arena/ Bera 3-Zînî/ Xenîm 4-LSD/ Tiralî/ Evîn/ Bîk 6-Ma/ Îrade 7-Dran/ Merez 8-Ode/ Finike 9-RAÎ 10-Aheng 11-Nî/ Ga 12-Neon

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmarê pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkîyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok.

Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Çend zarokên Kurd ê dibistana seretayî:

'Em serê sibê Türküm doğruyum naxwînin'

Li navçeyê Kurdistanê, li taxekê, du zarokên heşt salî li ber dîwarekî, di kolaneke teng de ji xwe re dileyîstin. Di nava berfê de bi destên tazî û solên bêgore, dibezîyan û glockên berfê davêtin hev. Ev herdu keç û kur, piştî du sê deqîqe dev ji leyîstikê berdan û berfa ser û guhên hev paqij kirin. Qazaxê herduyan jî, kesk û sor û zer bûn. Piştî hev û din ji berfê paqij kirin, di nava berfê de rûniştin û ketin xeberdanê. Dû re, ji nişka ve ya keçik dest bi straneke Kurmancî kir. Dema ez nêzîkî wan bûm keçik sekinî, şerm kir serê xwe tewand û di ber xwe re keniya. Ez çûm ba wan û ji wan re got: "Ez rojnamevan im, dixwazim bi we re bipeyivim û rismê we di rojnameyê de derxînim." Gotin "Baş, e." Mala keçikê pîr nêzîk bû, me lê da em çûn mala wê. Bi rêdana dê û bavê keçikê, min dest bi hevpeyvîna xwe kir. Vê hevpeyvînê em pêşkêşî xwendevanên xwe dikin, bila bibînin zarokên têkoşînê gihîştine ku derê.

Merheba ji te re

- Merheba.

Tu diçî mektebê?

- Erê, ez diçim sinifa 3. dibistana pêş (ilokul)

Kêfa te ji mektebê re tê?

- Erê, tê. Lê carna nayê, hindik tê.

Kêfa te ji çiyê wê re tê, ji çiyê re nayê?

- Carna mamoste zor dipirsin, hingê sifir distînim û li xweşî min nayê. Gava zor napir-



Zarokên Kurd di nava rengên kesk û sor û zer de dixemilin.

se, gava mamoste pirsên zor napirse kêfa min jê re tê.

Kêfa te ji mamosteyê te re tê?

- Carna tê, carna nayê.

Mamosteyê we Tirk e, an Kurd e?

- Tirk e.

Hûn li mektebê dikarin bi Kurmancî xeber bidin?

- Ku mamoste li bame ye, em nikarin xeber bidin û baciyan (stranan) bibêjin. Gava mamosteyê me dibîne em bi Kurmancî stranan dibêjin, an li me dide an jî sifir dide me.

Hûn stranên çî dibêjin?

- Carna em "Gerîla" dibêjin, carna "Wahatin pêşmerge me" dibêjin. Em êdî zehf "Lêxe gerîla lêxe" dibêjin.

Hûn tev bi hev re dibêjin?

- Kurik tev dibêjin, keçik jî, nivî nivî dibêjin.

Mamosteyê we behsa Atatürk dike an na?

- Carna heyata (jiyana) Atatürk ji me re dibêje. Mamosteyê me dibêje, "Ku ne ji Atatürk bûya hûnê tev bimirana." Hinek hevalên me dibêjin: "Na wele, emê nemirana,

Atatürk ne baş bû." Hingê, mamoste li wan dixe û sifir dide wan.

Tu ji Atatürk hez dikî?

- Na.

Çima?

- Çima wisa! Ew di televizyonê de bi Tirkî xeber didin, hinek zarok ji televizyonê fêmanakin. Ku bi Kurmancî bûya, wê herkes fêmanakira. Ku Atatürk hiştiba, serbest bikira, wê vêga jî Kurmancî serbest bûya û di televizyonê de wê Kurmancî hebûya. Atatürk zehf Kurd kuştine, lewma kêfa me jê re nayê.

Kêfa te herî zehf ji kê re tê?

- Ji Apo re tê, ji gerîla, wan re tê.

Çima?

- Ew tune bûna, vêga em di bin destê leşkeran de bûn. Ew me ji bin destê wan derdixin.

Apo dixwaze çî bike?

- Dixwaze ku ev şerxelas be, inca dixwaze Tirk û Kurd şer nekin, bibin birayê hev.

Apo kî ye?

- Apo me ye, her tiştê me ye jî, bavê me ye, serokê me ye, çavê me ye...

Gerîla û leşker çî ne, tu dizanî?

- Erê. Gerîla însanên



Feryal: "Serê sibê ez 'Türküm, Doğruyum' naxwînim, nivê sinifa me jî naxwîne"

baş in. Weke leşkeran ne pîs in. Leşker weke gû ne. Gerîla me nakujin, ji bo me xwe dikujin, canê xwe feda dikin. Leşker me dikujin.

Zarokên sinifa we, kêfa wan ji kê re tê û kîjan partiyê digirin?

- Zarokên sinifa me tev aliyê partiya Apo ne. Yek tenê ne ji aliyê Apo ye.

Ew ji aliyê kê ye?

- Ew Hizbullahçî ye, şeytanok e.

Hizbullah çî ye?

- Hizbullahçî dibêjin bila Apoçî jî Hizbullahçî bin.

Kêfa te ji wan re tê?

- Na, nayê.

Çima?

- Ew weke şeytan in. Navbera we û wî kurikê Hizbullahçî çawa ye?

- Kesek pê re xeber nade, di sinifa me de hevalê wî tunin. Kes

pê re nagere. Di tene-

fusê de kes pê re naleyîze. Ew roj, bavê wî hate sinifa me û got, "Zarokno, kurê min jî Kurd e, ew jî wek we Apoçî ye. Ew ne Hizbullahçî ye, bila ew jî bi we re bileyîze, ew jî birayê we ye, çima hûn pê re naşitexilin? "(Di vê navberê de hevalekî Feryal jî xwe nagire û çend gotinên di dilê xwe de ji min re dibêje) "Ez jî di sinifa Feryal de me, kêfa min jî, ji Apo re tê, ew weke leşkeran ne pîs e, ew baş e, Serokê me ye, bavê me ye. Hizbullahçî ne baş in, leşker û polis me dikujin."

Hûn serê sibê "Türküm, Doğruyum" dixwînin.


- Na, ez naxwînim.

Ez jî naxwînim. Nivê sinifa me zehftir naxwînin.

Çima?

- Em Kurd in.

Yekîtiya Nivîskarên Ermenî xelata rûmetiyê da Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan



Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan

Roja 22.03.1993'yan li paytexta Ermenîstanê, bajarê Yêrivanê Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullan Öcalan, ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Ermenîyan ve, bi yek dengî (bi temami) weke endamê hurmetê hate hilbijartin. Di meha Nîsanê de, wê Karlênê Çaçanî diploma ku li ser zîv hatiye nivîsandin, teslimê Serok Apo bike.

Yêrivan, Welat- Sekreterê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistanê, serokê di xewna zarokên Kurdistanê de, rêberê gerilayên ku di ser çiyayên Kurdistanê de têdikoşin û rêzanê, siyasêvan û rewşenbîrên Kurd ên pêşverû, tesîra zanîn û jîrbûna xwe ne tenê li gelê Kurd dike, her wiha rewşenbîrên biyanî û gelên din ên bindest jî bi vê şexsiyeta hêja û dûrbîn hisiyane.

Abdullah Öcalan, ne wêjevan e, yanê karê wî ne wêje ye, li berhemên wî wisa herîkî hatine nivîsandin, mirov dibêje qey karê wî yê yekemîn wêje û pişe ye. Lê hêlbet ew vî aliyê xwe û hemû qebiliyetên xwe, sirf di rîya şiyarkirin û rizgarkirina gelê Kurd û yên din ên bindest de bi kar tîne.

Nivîskarên Ermenî yên sosyalîst, demokrat û dostên gelê Kurd û yên bindest, di vê zanebûnê de, Abdullah Öcalan wek endamê hurmetê ji xwe re hilbijartin.

Ev bûyer, di dîroka Kurdistan û Ermenîstanê de dikare bibe destpêka demeke nû û biratiya van gelên ku bi sed-salan bi hev re jiyane, hîn xurttir û zeximtir bike.

Roja 22.03.1993'an li paytexta Ermenîstanê, bajarê Yêrivanê Sekreterê Giştî yê

PKK'ê Abdullan Öcalan, ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Ermenîyan ve, bi yek dengî (bi temami) weke endamê hurmetê hate hilbijartin.

Di deklarasiyona ku bi navê Serokê Yekîtiya Nivîskarên Ermenîyan Sêro Xanzadyan û Serokê Seksiyona Nivîskarên Kurd Karlênê Çaçanî hate belav kirin de, van peyvînan cih girt.

"Serok Abdullah Öcalan!

We bi serkariya xwe ya mêrxas ve, rîyeke nû ji bo azadî û serbestiya gelê Kurdistanê vekirîye.... Em bawar in ku, bi serokatiya we, PKK dê bi ser bikeve û ala azadiyê li ser Kurdistanê bimilmile....

We bi karkirina xwe ya aqilmend ve, wisa jî di nava dîroka literatûr û kultura gelê Kurd de, rûpeleke zêrîn vekir...

Em rind hay ji karkirina we hene, Hûn, wisa jî hesab dibin dostekî gelê Ermenî. Ez dizanim ku, hûn kar dikin ji bo ku dostaniya gelên Kurd û Ermenî, diha û diha mehkem bibe. Hûn ji dewleta Tirkîyê heyfa bav û kalên min hiltînin.

Serokê qedirgir! Hûn hatine hilbijartinê wek endamê Yekîtiya Nivîskarên Ermenî yê hurmetê. Hûn hogir, heval, xêrxwazê gelê Ermenî ne. Em

we bi dil bimbarek û pîroz dikin. Di karê we de serkeftin û pêşketinê dixwazin.

Bijî dostanî û biratiya gelên Ermenî û Kurd!

Bijî Kurd û Kurdistan!"


Serokê Seksiyona Nivîskarên Kurd, Karlênê Çaçanî jî, bersiva pirsên me wiha da: "Ya pêşin ew e ku Serok Abdullah Öcalan vê rojê li hemû welatên Sovyeta berê, li ser zimanê her Kurdekî ye.

Apo, qedirekî mezin di nava gelê Ermenî de jî standiye. Her roj, rojnamê û kovarên Ermenîyan der heqê Apo de, dinivîsin, şerkariya Apo bilind tê qîmetkirin. Bi qelesa Serok a afirandkar gelek pirtûk hatine nivîsandin, ku ne tenê rîya gelê Kurd ronî dikin, lê wiha jî hemû gelên cîran ji wan feyde digirin.

Abdullah Öcalan hesap dibê dost û pismamekî gelê Ermenî yê hezkirî. Lewma me bi yekdengî ev qerar qebûl kirîye."

Diha hêja ye were gotinê ku, Sêro Xanzadyan mêrxasê xebata sosyalistiyê ye û maddela "Stêrka Sor" wergirtiye û di dema xwe de endamê parlamantoya Sovyetê bû.

Di meha Nîsanê de, wê Karlênê Çaçanî diploma ku li ser zîv hatiye nivîsandin, teslimê Serokê PKK'ê Apo bike.



Serokê Seksiyona Nivîskarê Kurd Karlênê Çaçanî

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnişan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ